

## Utopyaya berbiçav: Li vir û niha [2]

'Çalakiya rasterast' pêkanîna rasterast a nêrîneke rasterast divê. Ango bi rêya vê awayê çalakiyê 'utopyayeke-mîkro' ava dibe, armanc û encam bi yekdengî û bi hemdemî bi hev re tên xuyakirin... ***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***



## Bigirî Asê!

Çîroka ez bêjim jî çîroka Asmîneke vê axê ye; dîmenek ji jiyana zarokên welatê me, hewar û gaziya dilê dayikekê ye. Roja pêncê hezîranê bû; Wargeha Mexmûrê ji aliyê firokeyên bêmirov ên dewleta tirk ve hat bombebarankirin... ***Reyhan Îke / R.5***



## Dîroka peykeran

Peyker yek ji hunerên herî kevnar ên li cîhanê ne, lê nayê zanîn ka ev huner ji kîjan demê ve dest pê dike. Lê di kifşên arkeolojîk de, di dema şikeftan de rastî şopên hunera peykeran tên. Yek ji nimûneyên ewil ê hunera peykeran... ***Hogir Ar / R.11***


# xwebûn

28 HEZÎRAN-4 TÎRMEH 2021 HEJMAR: 80 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# 'Em ê tune nebin'

Êrîşa rêxistinkirî ya li hemberî avahiya HDP'ê ya Îzmîrê hêrsa me zêdetir kir. Sekn û qêrîna dayika Denîz Poyraz, Fehîme Poyraz xwe li sûrên Kadîfekaleyê xist, ji wir xwe berda nav agirê di bedenên Rahşan Demîrel û Esen Aslan, rastiya berxwedanê ji nû ve welidand û xwe gihand milyonan. Piştî 30 salan, îro careke din dayikek kurd li Kadîfekaleyê bi qêrîna 'em ê tune nebin' hemû dilan dilerizîne. Dê sekna dayikên kurd kela zilmê hilweşîne... ***Dûrket Suren / R.2***




## Grevê 7 meh li pey xwe hişt

Dewleta tirk ji sala 1999'an vir ve tecrîdeke giran li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan dimeşîne. Heta niha li dijî tecrîdê gelek çalakî hatin lidarxistin lê dewleta tirk bi israr tecrîdkirina Ocalan didomîne. Herî dawî girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê li dijî tecrîdê û zextên li girtîgehan dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger kirin. Greva birçîbûnê li dehan girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê hatiye destpêkirin û grevê 7 meh li pey xwe hişt û ket meha 8'an. Her wiha li girtîgehan herî dawî koma 43'emîn çalakiya greva birçîbûnê dewr girt. Bi heman armancê li Mexmûrê jî greva birçîbûnê hatiye destpêkirin... ***R.3***

## Peyamên du hilbijartinan

Li Îranê du hilbijartinên serokkomariyê û şêwira bajar û gundan bi dawî bûn. Li hinek bajar û herêman nîvgerm û li piraniya wilayetên din jî pêşwazî pir sar bû. Îbrahîm Reîsî bû serokkomar. Rêjeya beşdariyê ji sedî 48,8 bû ku di hilbijartinên 12 dewletên berê da qet rêje ewqas kêm nebûye. Li pênc wilayetên rojhilatê Kurdistanê rêjeya herî kêm a beşdariyê careke din bi bîra Tehranê anî ku gelê kurd xwedî daxwazên xwe yên dîrokî û siyasî ye. Asta hişyariya gel di civaka Kurdistanê de bilind û heta daxwaza şêx, siyasetmedar û kesayetên naskirî jî nekarî xelkê ber bi sindoqên dengdanê ve bikişîne. Bandora banga partiyên siyasî, kesayetên serbixwe û tûrên civakî jî li ser biryara gel zêde hebû. Bi giştî civaka Kurdistanê careke din li pênc wilayetên mezin peyamên siyasî-civakî dane desthilata li Îranê... ***Kakşar Oremar / R.8***

## Pênaseya çand û teknolojiyê

Dema çand tê pênasekirin, pênaseya wê hema bêje ji al û qalê jiyanê digire nava xwe. Lewra pênaseya çand û jiyanê gelek nêzî hev in. Her wisa ger her afirînerî parçeyek ji teknolojiyê jî be, têgeha teknolojiyê jî ne gelek dûrî çandê ye. Her berhema çandî an bandor ji afirandina teknolojiyê girtiye an jî bandor li afirandina teknolojiyê kiriye. Êdî peyva teknolojiyê ji mekanîkê zêdetir, nermalavê/software û hişêçêkirî/artificial intelligence tîne bîra mirovan. Bi riya înternetê, ya herî dûr hatiye mala me û ber me. Hema bêje her aliyê jiyanê bûye çêkirî/sanal... ***War Botan / R.8***



# PDK dibe sedema yekitiya kurdan

Mijara yekitiya kurdan demeke dirêj e di rojevê de ye. Hemû hêzên kurdan herî zêde di 2013'an de nêzîkî vê pêvajoyê bûn. Ev pêşketin di asta herî jor de encama hewildana Tevgera Azadiya Kurdistanê bû. Berî vê pêvajoyê di salên 2000'î de û heta 2013'an bi pêşengiya şaredariyên Bakurê Kurdistanê konferansên wêje, mûzîk, şano, ziman, sinema, jin, ciwan, nivîskar û rojnamegerên kurd pêk hatin. Hin ji van konferansan çend caran hatin dubarekirin. .Çawa dibe ku PDK û Barzanî di yekitiya kurdan de rolek giring dilîze. Ev jî îroniyeke siyasetê ye. Carinan hin bûyer bandorên berovajî dikin. Rewşa Barzanî û PDK'ê jî îro heman bandorê dilîze. Ligel hemû derfetan jî di yekitiya gelê kurd de roleke erênî, baş û qenc nelîstin... ***H. Halît Alaçatî / R.6***

AGÎT YAZAR

## Gaboxeyê cixirandî yê bihêrs; Zagros... *R.12*

## Dem dema gêrê ye

Weke em hemû dizanin her malekê sermiyanekî wan heye. Rojekê ji rojan jîrkê malê (sermiyanê malê) pez û golikê xwe dibe sûkê difiroşe. Li nava sûkê digere lê dinêre canegayek werîs di stu de û di destê yekî de ye û bang dike; "Canegayê hêja! Canegayê hêja! Ê bikire poşman nabe?" Jîrkê malê li canegayê dinêre û di dilê xwe de dibêje: "Bavo çi canega ye, wek dîwarekî ye bi qesema navê Xwedê ez ê wî bikirim." Hêdî hêdî diçe cem. Xwediyê canega ew jî di dilê xwe de dibêje: "Ev ê were canega bipirse emrê wî derbas bûye, ji tiştekî re jî nabe. Ez erzan bibêjim viya ê nekire... ***Mehmet Devîren / R.10***

## Reh û rê

Rê û reh wateya jiyanê ne jî. Her kes, civak, kom, komik, azbet, eşîr, gel, netew û hwd. xwedî rê û rehekê ne. Tê zanîn ku reh dar, giha kulîlk û her wiha riwekan bi erdê ve girêdidin û wan xwedî dikin, avê dikişînin bedena wan û tiştên ku wan xwedî dikin jî wek mîneralan û her wiha, bi ser de dikin ku ew rast, nerm, libayî û tîk bisekinin û ji hewa û rojê jû sûdê wergirin, ne bes e xwarin û pêxwarinên ajal û mirovan jî amade dikin... ***Feratê Dengizî / R.5***



## Don Kîxotê me kurdan

Derhênerê şanoyê Ferhadê Feqî bi berhama Don Kîşot ku dê derîne ser dika şanoya Bajêr, derket pêşberî bîneran. Feqî têkildarî lîstika şanoyê pirsên rojnameya me bersivand... ***Hevpeyvîna Bêrîvan Kayi / R.4***

## Dewlet îşkenceyê li Ozkan dike

Girtiyê nexweşê giran Mehmet Emîn Ozkan ê 83 salî ku li Girtîgeha Tîpa D a Amedê dimîne li ser rewşa wî ya tenduristiyê xerab bû, di mehekê de 7 caran rakirin nexweşxaneyê. Ozkan ê bi awayekî dest kelemçekirî di dorpêça leşkeran de rakirin nexweşxaneyê, careke din birin girtîgehê. Herî dawî Ozkan ji bo rapora tenduristiyê bi wesayîta rîngê sewqî nexweşxaneyeke Xarpêtê hat kirin. Bi hinceta ku nexweşxaneya rayedar Amed e, dîsa şandin girtîgehê. Ozkan ê roja ku birin Xarpêtê û dîsa anîn girtîgehê birçî hat hiştin. Desteya Tenduristiyê, ji bo nirxandina nexweşiya dil a Ozkan ê 5 caran krîza dil derbas kir û 4 caran jî anjiyo bû biryara ku sewqî Saziya Tiba Edlî (ATK) ya Stenbolê were kirin da. Tê payîn ku dê Ozkan bibin Stenbolê... ***R.6***

# Biherike Denîz bila behr jî çem û rûbar jî di şopa te de xweş biherikin...



Dûrket Suren

Li ser bedena ku Rahşan bibû Newroz, qêrîna min a em ê li ber xwe bidin li seranserê welêt deng vedabû. Piştî 30 salan, îro careke din dayikek kurd li Kadîfekaleyê bi qêrîna 'em ê tune nebin' hemû dilan dilerizîne

Di 17'ê Hezîranê de, di danê sibehê de, beriya ku kompîtira xwe vekim, beriya ku nûçeyên ketine ser ajansan bixwînim min berê xwe da kulîlkên di şaneşînê de û bi wan şa dibûm. Şabûn... ji bo kurdan ev peyv ji razberiyê jî wêdetir hesteke pir dûr disekine û şabûna min jî mixabin tenê bi wê kêliyê re sînordar ma.

Êrîşa rêxistinkirî ya li hemberî avahiya HDP'ê ya Îzmîrê, hêrsê li me kir behr. Ev êrîş ne cara ewil bû ku em rastî wê dihatin, lê me bi berdêleke mezin careke din ferq kir ku jiyan ji kurdan re hatiye heramkirin û heta azadî pêk neyê dê aramî ji kurdan re ne gengaz be. Li avahiya HDP'ê, di şexsê Denîza devliken, Denîza dilnizm, Denîza keskesor de kurd careke din di encama nefreta li hemberî hebûna kurdan de hatin qetilkirin. Li ber deriyê wê avahiyê qêrîneke çi qasî bilind bê bihîstin ew qas bilind û bi bandor dengek, seknek berz dibû 'Ez ê li hemberî wan serî netewînim! Ez ê hilneweşim! Denîzek çû dê hezar Denîzên din bên!'

Ew sekn sekna salan a jinên kurd bû. Ew sekneke wisa bû ku hesabên qetlîaman vala derdixist. Sekn û qêrîna dayika Denîz Poyraz, Fehîme Poyraz xwe li sûrên Kadîfekaleyê xist, ji wir xwe berda nav agirê di bedenên Rahşan Demîrel û Esen Aslan, rastiya berxwedanê ji nû ve welidand û xwe gihand milyonan. Ew hesabên rûyê naskirî yên kujerên kurdan careke din qelibîn. Bi hezaran, bi milyonan kes bi dengê dayê Fehîme re bûn yek deng, bûn yek berxwedan. Li dora Denîz bûn behr û rûbar û herikîn.

**Bûm mêvanê Denîz!**

Li Îzmîrê, li bin Kadîfekaleyê, mêvanê mala Denîz im. Dayê Fehîme li gel dile wê diêşe jî sekna xwe ya destpêkê diparêze. Sekna wê sekna rastiya dayikên kurd ên bi berxwedêr e. Peyama diya Rahşan Demîrel, Emîne Demîrel a ji malbata Poyrazê re şandibû jî vê yekê piştrast dike. "Li ser bedena ku Rahşan bibû Newroz, qêrîna min a em ê li ber xwe bidin li seranserê welêt deng vedabû. Piştî 30 salan, îro careke din dayikeke kurd li Kadîfekaleyê bi qêrîna 'em ê tune nebin' hemû dilan dilerizîne. Her çend dem mîna çemekê diherike jî dê sekna dayikên kurd keleha zilmê hilweşîne."

Belê dem diherike lê bi demê re sekna dayikên kurd a li hemberî bişaftinê, li hemberî qetlîaman, li hemberî nenaskirina nasnameya kurdewarî û bi wan hestên zarokên xwe yên azadîxwaz jî diherike. Mînaka dayê Fehîme jî yek ji wan mînakên jinên kurd e ku ev sed sal in li dijî parçekirina kurdan, li dijî tunekirina kurdan li ber xwe dide. Dema rastî ev be pêwîstiya jinan a hêzê bide xwe û derdora xwe du caran zêdetir dibe. Li hemberî ew qas zextên salan parastina xwebûniyê bêguman ne hêsan e. Her dever hatiye dorpêçkirin, deng ji kê derkeve tê xwestin bêbandor bikin, ger ji destên wan bên dê bi carekê de kurdan xelas bikin. Heger li gel ew qas nefreta li dijî kurdan armancên serdestan pêk nehatibe di destpêkê de divê têkoşîna dayikên kurd were bibîranîn. Li ber deriyên hepsan bigire heta kolan û çalakiyan rûyê dayikên kurd xwe her nîşan daye. Her çend kêm dayikên me çûbin dibistanan û kêm ji wan perwerde dîtibin jî têspît, nêzîkatî û hêza wan a li dijî qirkirinê ji bo gelê kurd diyarde ye.

Fehîme Poyraz, dayika Denîz Poyraz ji wan dayikên me ne. Dema hevjînê wê di girtîgehê de bûye hemû debara mala xwe dispêre ser milên xwe û dema roja hevdîtinan de diçe girtîgehê jî naxwaze zehmetiyên ku li pêşberî wê derdikeve bi hevjîn û hevalên girtî re parve bike. Vê yekê jî wek peywirek dibine dayê Fehîme û dibêje pêwîst bû ku hevalan me bi moral bidîta. Bi çi awayî be jî li derve divê em bi hêz bin da ku hevalên girtî jî bi vê yekê kêfxweş bibin.



**Helwesta dayikê helwesta kurdan e**

Bajarê Îzmîrê yek ji bajaran e ku ji ber polîtîkayên koçberkirinê bi hezaran kurd lê bi cih bûne. Ji ber şerê heyî koçberî ji jiyana kurdan kêm nebûye û kurd di rêwîtiya xwe ya koçberiyê de hem ji bo jiyana xwe biparêzin hem jî ji bo neyên bişaftkirin li ber xwe dane. Dayê Fehîme dema behsa koçberkirina xwe ya ji axa xwe dike diyar dike ku li gel her tiştî ew tu carî ji têkoşînê poşman nebûye. Girêdayîna kurdan a bi nirxên xwe dişibîne bexçeyê gul û çîçekan û dibêje têkoşîn ew qasî xweşik e ku kesan bi hêz dike. Wê zarokên xwe di nav xizaniyê de mezin kiriye, wê zarokên xwe li dijî bişaftinê li partî û saziyên kurdan mezin kiriye, wê zarokên xwe di serdegirtin û li ber rêya girtîgehan mezin kiriye. Helwesta wê ya li dijî qetlîama keça wê helwesteke birûmet li hemberî hemû gelê kurd e.

**Denîza rû biken**

Denîz bi rûkeniya xwe, bi dilnizmiya xwe ji hêla derdorê ve tê nasîn. Dema dayê Fehîme jî behsa wê dike dibêje ku ez ê her keça xwe bi rûyê wê yê bi ken û ruhê wê yê nazik bi bîr bînim. Gelê kurd û hemû gelên li derdora Denîzê civiyan jî dê wê her bi vî awayî bi bîr bînin. Her çend parastvanên kujeran ango plansazên qetlîam pêk anîn rastiya qetlîamê berovajî bidin nîşandan jî ev lîstik dê negire. Heqîqet helwesta dayika Fehîme Poyraz e. Heqîqet li ku be bila be kurd dê heta azadiya xwe têkoşîna xwe ya rûmetê berdewam bikin. Dê têkoşîna Denîzê bi têkoşîna kurd re mîna behrê, mîna çem, kanî û rûbaran her biherike...



Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

## Utopyaya berbiçav: Li vir û niha 2

Ji ser nivîsa min a dawî re du hefte derbas bûn; di vê navberê de Denîza me bi destê nijadperestekî çavsor ji nav me çû, çavdêrên aştiyê hem li Ewropayê û hem jî li başûrê Kurdistanê leqayî astengiyan hatin, êrîş li ser seyrana LGBTİ+yan hat kirin; jinên li hemberî betalkirina peymana Stenbolê derketin qadan, bi erdê ve hatin kişandin û gelek bûyerên din di vê navberê de qewimîn. Ji ber van bêoxiriyan bêhêvîtiya nav civakê hîn mezintir bû. Li gel van bûyerên neyînî di derbarê utopyayeke şênber de nivîsandin ku doza li vir û niha dike, ne hêsan e. Em bi gotina 'dê rojên xweş teqez bên' hînî xwe-aşkirinê bûne, em ê di nav rojên bi ewr û tarî de çawa doza rojên xweş û azad ên li vir û niha bikin!

Sakîne Cansız di hevpeyvîneke xwe de dibêje ku "me tu carî wekî utopyayekê li sosyalîzmê nenihêrî. Sosyalîzm ji bo me tu carî ne tiştekî dûr bû. Ji dêlva xeyalkirinê me yekser dest pê kir, hêvî û utopyayên xwe li vir û niha bînin cih." Hêvî û daxwaza jiyaneke azad û wekhev ne tenê xeyalkirin, di heman demî de wê jiyandin hişt ku bi hezaran mirov ji bo vê armancê bedelên giran û mezin bidin. Ev bawerî jî hîn rê û rêbazên taybet divê. Wek mînak azadiya jinan wek navenda azadiya civakê dîtin û li gorî vê yekê pratîka xwe sazkirin, yek ji rêbaza vê baweriyê ye. An jî bi giştî paradîgmaya modernîteya demokratîk li ser vê hişmendiyê hatiye sazkirin. Modernîteya demokratîk wek pergala alternatîf li dijî moderniteya kapîtalîst pêş xistin, bingeha xwe ji vê rastiyê digire. Di roja heyî de avakirina alternatîfa kapîtalîzmê bû mijara gelek civaknas û teorîsyenên cîhanê. Abdullah Ocalan wek teorîsyenê modela modernîteya demokratîk projeya xwe li ser analîzên Andre Frank û Immanuell Wallerstein pêş dixe. Li gorî Frank ku "di nav yekitiyê de cudahî"yê diparêze, pergala alternatîf a humanîst û li dijî eurozentrîzmê dikare di nav pergala kapîtalîst de pêş bikeve. Ligel vê Wallerstein dibêje di nava pergala heyî de alternatîfek nikare bê avakirin. Li gorî wî dinya di nav du polan de maye. Li aliyekê serdestên kapîtalîst, li aliyê din jî bindestên cîhanê dimînin. Ji vê kaosê dibe ku pergaleke nû derkeve. Lê dê kîjan alî serkeftî be, girêdayî têkoşîna ehlaqî û polîtîk a her du aliyan e.

Girêdayî van çarçoveyên teorîk Ocalan dibêje ku ji destpêka mirovatiyê heta niha di nava civakê de rehên modernîteya demokratîk heye. Wek Sakîne Cansiz baweriya xwe ya utopyaya berbiçav bi vî awayî tîne ziman: "Modernîteya demokratîk, ango hebûna hêzên şaristaniya demokratîk a li vir û niha, ne bîranîneke serdema zêrîn a berê ye û ne jî utopyayeke pêşerojî ye. Hebûna yekîneyên civakî yên ku li dijî berjewendiya pergala kapîtalîst her tim li ber xwe didin, vê rastiyê nîşanî me didin."* Li gorî Ocalan civak bi giranî antî-kapîtalîst e. Lewre bandora serdestiya mêtingeriyê roj bi roj dijî. Ji ber vê yekê jî ne pergala "kapîtalîzma misoger" û ne jî ya "demokrasiya misoger" heye. Xwezaya civakê pirrengî û pirçandî ye. Tevî vê têkiliya tevlihev Ocalan dibêje "di bingeha xwe de civak di vê serdema hegemonîk a kapîtalîzmê de dîsa jî demokrat e." Ji xeynî navendbûna azadiya jinan, perspektîfa ne li ser esasa hêz û dewletê, lê li ser esasa civaka kolektîf pîvana din a girîng a vê modelê ye. Ango bi gotineke din "parek ji pastayê naxwaze, ji bo herkesî baqlewe dixwaze."**

Pîvana sêyemîn a vê pergalê 'çalakiya rasterast' (direct action) e. Pêşengê teşeya vê çalakiyê antropologê anarşîst David Graeber bû. Graeber pergala Konfederalîzma Demokratîk a li Rojava ji nêz ve û bi hêvî dişopand. Mixabîn pir zû jiyana xwe ji dest da û ji nav me çû. Di destên me de analîz û nirxandinên wî yên girîng ên di derbarê rêbazên avakirina pergalên alternatîf de man. 'Çalakiya rasterast' pêkanîna rasterast a nêrîneke rasterast divê. Ango bi rêya vî awayê çalakiyê 'utopyayeke-mîkro' ava dibe, armanc û encam bi yekdengî û bi hemdemî bi hev re tên xuyakirin. Her wiha çalakiya rasterast wekî ku dewlet û saziyên wî tune bin, tevdigere. Dema mirov êrîşên dewletê yên rojane yên li hemberî kesên ku ne mîna wî ne bifikire, dibe ku dewlet û saziyên wî tune hesibandin, zehmet be. Lê li vê derê armanc ew e ku mirov alternatîfa xwe li ser nehesibandina wan ava bike. Ev hemû rê û rêbaz me digihînin rêyekê: mudaxeleya yekser a ji bo guhertinê ya bi rêya xwerêxistinkirinê.

Lewma ye ku êdî ew roj ne diyar e, lê rê û rêbaz bi xwe wek şoreş tê hesibandin. Lewma ye ku yên rêxistinkirî tu carî wekî Denîz hêviyê ji dilê xwe, kenê ji rûyê xwe kêm nakin. Ne jî wek dê û bavê Denîz ji baweriya serkeftinê, ji têkoşîna demê û ji hêrs û rika xwe ya ji ber neheqiyê gavekê şûn de navêjin. Ya ku hêvî û baweriya rojên azad û wekhev teqez dike jî ev pergal e. Ger ne li pêş çav be, ger bi ked neyê stirîn, dê ne ya me be û ne jî dê were.

* Abdullah Ocalan (2015) Kapîtalîst Modernîteye Meydan Okumak II

** Diruşmeya 1'ê Gulana 2021'an li Berlînê: "Em ji pastayê pariyek naxwazin, em ji bo herkesî baqlewe dixwazin!" ***(dawî)***

## Li Xarpêtê qeza: 3 kes mirin

Dolmîşa ku kesên ji Mereşê ji bo dawetê diçû Qersê piştî 30 kîlometreyan ya rêya Xarpêtê û Çewligê de qeza kir. Dolmîş li qamyona li kêleka rê sekinîbû qelibî. Hat ragihandin ku 3 kesên di dolmîşê de jiyana xwe ji dest dan û 12 kes jî birîndar bûn. Kesên birîndar rakirin nexweşxaneya bajêr û cenazeyên kesên jiyana xwe ji dest dan jî rakirin morga Nexweşxaneya Zanîngeha Firatê. ***XARPÊT***

## Rojnameger bi zextan re rû bi rû ne

Li Tirkiye û Kurdistanê zextên li hemberî rojnamegeran dewam dikin. Di 4 salên dawî de der barê rojnamevan Oktay Candemîr de 40 lêpirsîn hatine kirin. Lêpirsîn ji ber nûçeyan û parvekirinên li ser medyaya sanal hatine kirin. Danişîna 13'emîn a doza bi îdiaya "endamtiya rêxistinê" û "propagandaya rêxistinê" li rojnameger Kîbriye Evren hatibû vekirin, li 5'emîn Dadgeha Cezayê Giran a Amedê hat lidarxistin. Evren beşdarî danişînê nebû. Di danişîna doza rojnamevan Kîbriye Evren de daxwaz hat kirin ku dozên wê bibin yek. Midurê Karê Nivîsan ê Rojnameya Azadiya Welat ku bi KHK'ê hatibû girtin Îsmaîl Çoban û 2 girtiyên din, ji Girtîgeha Tersûsê ya Mêrsînê sirgûnî Girtîgeha Tîpa L a Hejmar 2 ya Turkoglu ya Gurgumê kirin. ***AMED***

## Bazareke din a Hewlêrê şewitî

Agir bi 'Hewlêr Mall'ê ket û nêzî 20 dikanan zirar dît. Li gorî agahiyan dikandaran derdora 300 hezar dolarî zirar kirine. Li gorî agahiyên ku Berdevkê Parastina Şaristanî ya Hewlêrê Serkewt Kareş daye 5 dikan bi temamî şewitîne û bi giştî 20 dikanan zirar dîtine. Têkildarî sedema derketina şewatê Kareş diyar kir ku niha nikare tu agahiyekê parve bike, lewra lêkolîn hîn berdewam dike û li kamerayên dikanan jî temaşe dikin, ji bo sedema şewatê tespît bikin. ***HEWLÊR***

## Ji bo her lître benzîn 200 dînar bac

Serokê Tevgera Nifşê Nû Şaswar Ebdulwahîd têkildarî buhabûna benzînê civîna çapemeniyê pêk anî. Ebdulwehîd diyar kir ku ji ber standina bacê û ji aliyê kompanyayên hizbî ve destdanîna li ser parzûngehan, nirxê benzînê giran bûye û wiha got: "Li Herêma Kurdistanê ji bo hilberîna lîtreya benzînê 200 dînar tê mezaxtin û didin 750 dînarî. Eger benzîn ji derve were hawirdekirin, ji aliyê partî û hikûmetê ve bac û pereyeke zêde tê standin. Ji bo her lître benzîn 200 dînar bac tê standin." ***SILÊMANÎ***


## Li Amedê afîşên Bahçelî hatin rakirin

Serokê Giştî yê MHP'ê Devlet Bahçelî ku di her daxuyaniya xwe de heqaretê li kurdan dike, gotinên xwe yên der barê kurdan de li afîşan bi cih kir û di bin kontrola polîsan de li kuçeyên Amedê daleqand. Amediyan bertek nîşanî Bahçelî dan û afîşên wî ji kuçeyên amadê rakirin. ***AMED***

# Aşkera ye ku êrîşeke plankirî ye

**Bi awayekî organîze bi ser avahiya HDP'ê ya Îzmîrê de girtin û Denîz Poyraz qetil kirin. Bêyî ku lêkolîneke baş bikin bi lez û bez qatil xistin girtîgehê û di axaftinên Devlet Bahçelî de derket holê ku êrîşeke organîze û plankirî ya dewletê ya nû ye**

| Navenda Nûçeyan



Di 17'ê hezîranê de nîjadperest û qatilê bi navê Onur Gencer bi ser avahiya HDP'ê ya Îzmîrê de girt bi çek endama HDP'ê Denîz Poyraz qetil kir. Kujer piştî ku hat girtin lêkolîneke baş nehat kirin bi awayekî lez û bez hat girtin.

Malbata Poyraz bi sekna xwe bersiv da êrîşkaran û bal kişandin ser domandina têkoşîna li hemberî zilmê. Di serî de li bajarên Kurdistan, Tirkiye û gelek deverên din bi meş û çalakiyên girseyî êrîş hat şermezar kirin.

Parêzerên HDP'ê û malbata Poyraz ji bo lêpirsîn bi awayek bandor were birêvebirin, di 21'ê hezîranê de daxwaznameyak ji 10 rûpelan ku 38 xalan têde cih digirt pêşkêşî dozgeriyê kirin.

**Baş lêkolîn nehat kirin**

Ji parêzerên Komîsyona Hiqûqê ya HDP'ê Turkan Aslan ku lêpirsînê ji nû ve dişopîne bal kişand ser kêmasiyên di lêpirsînê de. Aslan destnîşan kir ku li avahiya HDP'a Îzmîrê bi awayek hûrgilî lêkolîn nehatiye kirin û heke bi hûrgulî bihata lêkolînkirin wê delîl bêtir bi rêk û pêk bihatina berhevkirin.

Parêzer Aslan got ku li gorî lêkolînên pisporên Tiba Edlî dibe ku beriya Denîz Poyraz were kuştin rastî îşkenceyê hatibe û xwest li ser kêrên bi qatilan re hatine desteserkirin testa DNA'yê were kirin.

**Bahçelî li xwe mikur hat**


Serokê Giştî yê MHP'ê Devlet Bahçelî hefteya borî Denîz Poyraz hedef nîşan da û qetilkirina wê rewa nîşan da. Bahçelî îdia kir ku Poyraz mîlîsa PKK'ê ye û terorîst e. Hevseroka HDP'ê Pervîn Bûldan bertek nîşan da û da zanîn ku Bahçelî kuştina Poyraz girtiye ser xwe. Berdevka Meclisa Jinê ya HDP'ê Ayşe Acar Başaran, bersiv da Bahçelî û wiha got: "Em hemû Denîz Poyraz in."

Rojnameya Avrupa ya li Bakurê Qibrisê weşanê dike, gotinên Devlet Bahçelî yê ku Denîz Poyraz û malbata wê kiribû hedef, bi manşeta "TU YÎ Terorîst" derket.

**Berdevkê şerê taybet**

Cîgirê hevserokê HDP'ê Tayîp Temel têkildarî êrîşa li Îzmîrê û daxuyaniya Devlet Bahçelî ji rojnameya Yenî Yaşamê re axivî. Temel anî ziman ku Devlet Bahçelî berdevkê şerê taybet e û kirasê siyasetê li xwe kiriye. Temel da zanîn ku di erîşa dawî de jî derket holê ku hevkarê biçûk ê hikûmetê ango MHP wek tetîkkêşan tê bikaranîn û gelek caran li dora partiya wan kom dibin û hewl didin êrîşan pêk bînin. Temel got ku hêzên demokrasiyê û HDP dê li hemberî van êrîşan paş ve gav neavêjin û dê têkoşîna xwe bidomînin.

# Greva birçîbûnê 7 meh li pey xwe hişt



Dewleta tirk ji sala 1999'an vir ve tecrîdeke giran li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan dimeşîne. Heta niha li dijî tecrîdê gelek çalakî hatin lidarxistin lê dewleta tirk bi israr tecrîdkirina Ocalan didomîne. Herî dawî girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê li dijî tecrîdê û zextên li girtîgehan di 27'ê mijdara 2020'î de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger kir. Greva birçîbûnê li dehan girtîgehên Kurdistan û Tirkiyeyê hatiye destpêkirin û grevê 7 meh li pey xwe hişt û ket meha 8'an. Her wiha li girtîgehan herî dawî koma 43'emîn çalakiya greva birçîbûnê dewr girt.

Bi heman armancê li Kampa Penaberan a Mexmûrê, jinan di 18'ê Kanûna 2020'î de çalakiya greva birçîbûnê dan destpêkirin û zêdetirî 190 roj in grev dewam dike. Penaberên ku li Kampa Lavrîo ya Yewnanistanê dijîn nêzî 180 roj in di grevê de ne.

Berdevka HDP'ê Ebru Gunay têkildarî grevên birçîbûnê yên li zindanan dewam dikin axivî û wiha got: "Daxwazên girtiyên siyasî daxwazên mafên mirovan û edaletê ye ku daxwazên mafdar ên bi milyonan mirovî ye." Gunay bertek nîşanî tecrîdê da û ev tişt anî ziman: "Sîstema tecrîdê ya li ser Birêz Ocalan û hewldana ji bo serweriya kaos, mafya, rizandin û şer a li welêt ji hev cuda nîne. Em timî diyar dikin ku sîstema li Îmraliyê rêbazeke rêveberiyê ye. Pêkanînên li Îmraliyê nîşaneya nêzîkatiya li gelê Kurd, li gelên Tirkiyeyê û hêzên demokrasiyê ye. Dema ku li Îmraliyê atmosfereke çareseriyê hebe, ev yek bandorê li tevahiya Tirkiyeyê dike. Dema ku li Îmraliyê desthilatdariya siyasî li zingilê şer dide, hingî Tirkiye dikeve nava kaosê." ***AMED***

# Di 4 mehan de 434 kesan întîhar kirin

| Navenda Nûçeyan

Ev demeke dirêj e ku li Tirkiye û Kurdistanê hejmara xwekuştin û mirinên biguman zêde bûye û roj bi roj zêdetir dibe. Piraniya ev kesên ku dawî li jiyana xwe tînin xort û jinên ciwan in ku temenê wan bi giranî di navbera 20 û 30 salî de ne.

Di navbera salên 2002 û 2019'an de ji ber pirsgirêkên der barê 5 hezar û 806 kesan întîhar kirin û dawî li jiyana xwe anîn. Her wiha li gorî rapora Parlementerê CHP'ê yê Enqereyê Tekîn Bîngol, di sala 2021'ê de di meha çileyê de 94, di sibatê de 99, di adarê de 112 û di nîsanê de jî 129 kesan dawî li jiyana xwe aniye.

Herî dawî li gundê Fêra ya navçeya Farqînê ya girêdayî Amedê ji malbatekê ango 2 xwişk û birayekî li dû hev întîhar kirin. Hevşaredara Farqînê Naşîde Toprak ku di 24'ê Adara 2020'î de ji peywira xwe hatibû girtin û li şûna wê kayûm hatibû tayînkirin ji rojnameya me re axivî.

Naşîde Toprak da zanîn ku ji destpêka sala 2020'î heya niha mixabin, li Farqînê 20 mirovî întîhar kirin û got: "Belê rast e di nav çend rojan de li gundê Fêra ya Farqînê du xwişk û birayekî li dû hev întîhar kirin. Tiştên ku me guhdar kir û lêkolîn kir; malbat di halê xwe de jiyanekê didomîne. Bavê malbatê kedkarek e û di karên giran de xebatan kiriye. Rewşa wan a aborî jî zêde ne baş e. Bavê zarokan sala borî duçarî krîza dil dibe û jiyana xwe ji dest dide. Li ser mirina bavê wan derûniya zarokan xerab dibe. Malbat dikeve nav valahiyeke mezin û di nav neçariyekê de dimînin. Debara malbatê jî dikeve ser milê ciwanan û kar û xebateke ku bikin jî tune ye. Di nav vê tunebûn û neçariyê de ciwanên bi navê Muhammed Şîmşek ku 26 salî ye, Rengîn Şîmşek 22 salî û Mîzgîn Şîmşek 23 salî ye, bi dorê du xwîşk û birayek întîhar dikin. Bi kurtasî ev tê gotin."

Toprak da zanîn ku sedema xwekuştinan a herî mezin polîtîkayên hikûmeta AKP'ê ne û li ser gel polîtîkayên qirêj tên meşandin û mirovan bêzar dikin û wiha got: "Ciwan ji ber van neheqiyan çareseriyê di întîharê de dibînin. Mirovan bê hêvî bê bawerî hiştine.




## DİVÊ DERDÊ BERHEMÊN ŞANOYÊ Û YÊ BÎNERAN YEK BE

# Don Kîxotê me kurdan kî ye û çawa ye

Bêrîvan Kayı

*Çîroka Don Kîşotê 'dînik' ji aliyê gelek kesan ve hatiye xwendin. Ev romana ku ji aliyê Carvantesê îspanyayî ve hatiye nivîsîn gelek caran ji bo opera, bale û şanoyê jî bi gelek zimanan hatiye veguhaztin. Ferhadê Feqî (Ferhad Keskîn) ku derhênertiya lîstikên wek Xewna Şeveke Havînê kiriye niha jî bi berhema Don Kîşot ku dê derîne ser dika şanoya Bajêr, derket pêşberî bîneran. Têkildarî lîstika Don Kîşotê me çend pirs ji Ferhadê Feqî pirsîn.*



Em dikarin bêjin ku ziman bi berhemên nivîskaran jî dewlemend dibin, berfireh dibin, pêş dikevin. Ji ber vê jî wergera ji zimanê biyanî girîng e helbet û li zimanê kurdî jî pir tê. Ma heta kengî em ê ji folklora xwe bixwin û bixwin

**Ferhadê Feqî heta niha bi çend berheman tev li xebatên Şanoya Bajêr bûye û Don Kîşot kengî kete rojeva te?**

Ez bawer dikim sal 2009 bû, li Amedê di Şanoya Bajêr de me bi lîstika 'Yaşar heye yan tune ye' ya Azîz Nesîn çêkir. Me bi kurdî- tirkî çêkir. Çima bi tirkî? Ji ber ku di nav kurdan de karê burokrasiyê tim bi tirkî bû û me jî da vegotin. Di vê çîrokê de Azîz Nesîn li hemberî burokrasiya heyî, hebûna xwe îspat dikir. Berê jî dema min ev çîrok dixwend tê de çîroka kurdan didît. Piştî wê me şanoya bi navê 'Daweta Xwînî' li ser du versiyonan yek li Dihokê ya din jî li Amedê, çêkir. Xewna Şeveke Havînê jî me amade kiribû. Herî dawiyê me dest bi Don Kîxotê kir. Demekê, ez ne şaş bim di sala 2014'an de, bi teksta Zana Mazdak me dest bi lîstika Don Kîxot kiribû lê mixabin li Sûrê şer dest pê kir û me nikarîbû çêbikira. Êdî ji wê rojê ve tim di serê min de mabû ku ez ê careke din vegerim ser çîroka Don Kîxot û derînim ser dika kurdî. Herî dawiyê jî me dest bi provayên wê kirin. Ez bi hêvî me ku em ê Don Kîxotekî bînin ser dika kurdî.

**Niha min ferq kir ku tu Don Kîşot wek Don Kîxot bi nav dike. Çima?**

Bi qasî ez dizanim tirkan ji Fransî wergerandine tirkî. Fonetîka fransî hilgirtine loma bûye Don Kîşot. Bi spanî jî wek tê zanin ku 'x'ê bi kar tînin. Bi almanî jî Don Kîxoth bi kar tînin. Vêce rastiyeke me heye ku derfet çênebûye ku kurd têkiliya xwe rasterast bi cîhanê re deynin. Têkiliya me bi berhem û çanda cîhanê, li ser Tirkiye, Îran, Sûriye û Iraqê re çêbûye. Ev berhemên cîhanê jî di fîltreya wan zimanan de derbas dibin û encex bi wî awayî derbasî kurdî bûne. Em rastiya wan jî gelek caran nizanin. Vêce îro dem guherî, kurd êdî ji zimanên biyanî berhemên klasîkên cîhanê ew bixwe werdigerînin. Madem em ê cara yekem vê lîstikê (wek ez dizanim jî ev cara yekem e) em ê bînin ser dika şanoya kurdî, wê demê em navê wê yê resen (spanyolî) bi kar bînin. Ji bilî wê jî li ba min navê wê yê resen xweşiktir li kurdî tê.

**Di şanoyê de gelek berhemên klasîk ên wek Macbetha Shakespeare, Tartuffeya Molîere, Bêrûya Dario Fo û gelek kesên din hatin amadekirin. Niha jî bi klasîkeke wek Don Kîşot hûn derkevin ser dikê. Gelo Don Kîşot ango berhema Carventes hesteke çawa da te û dê bandoreke çawa li bîneran bike?**

Piştî ku Don Kîxot were ser dikê dê êdî dilê min rihet bibe ji ber ku barekî 5-6 salan e li ser pişta min e û bi xwe re digerînim. Dema were ser dikê dê êdî barê xwe deynim. Ya din jî bi rastî pir bi dilê min e ku klasîkên cîhanê werdigerînin zimanê xwe. Ev berhem xîtabî hemû cîhanê dikin. Mixabin kurd ji vê zengîniyê heta demekê jî dûr bûn lê niha em ê para xwe êdî ji van berheman bigirin.

Berhemên wek ên Shakespeare ango di zimanê rojavayiyan de, di yê almankî, ingilizî de qeziyên rojane hene kes nizane ew qeziyên Shakespeare in, ew dîtine, ew afirandine lê bûne malê gel. Em dikarin bibêjin ku ziman bi berhemên nivîskaran jî dewlemend dibin, berfireh dibin, pêş dikevin. Ji ber vê jî wergera ji zimanê biyanî girîng e helbet û li zimanê kurdî jî pir tê. Ma heta kengî em ê ji folklora xwe bixwin û bixwin. Hewce ye em hinekî berê xwe bidin berhemên cîhanê û ji fikrên wan, çanda wan sûd wergirin da ku em zimanê xwe bi pêş bixin. Ev nayê wê wateyê ku hema tenê em wergerê bikin. Na hem çanda kurdî hem jî ji berhemên biyanî hewce ye em binivîsin û bînin ser dikê û her du bi hevûdu re bimeşin. Hêzê bidin hevûdu. Encex bi vî awayî em ê bikaribin valahiyê dagirin û zimanê xwe, hunera xwe pêşdetir bixin. Yanî tenê folklora me nabe an jî tenê wergerên biyanî nabe. Xala din a girîng jî ew e ku berhema em digirin dest jî hewce ye ji çanda me jî ne dûr be û li gor wê em kesayetên xwe ava bikin. Civaka kurdî jî divê kesayata xwe ava bike. Divê em dewlemendiya cîhanê û ya xwe sentezeke wê çê bikin. Heta hetayî tenê di rûnekî de qelandin, çênabe.

**Ez dixwazim hinekî qala kesayetên çîroka Don Kîşot jî bikim. Mesela di lîstikên din ên hatine pêşkêşkirin de ji kesên wek Ophelîa, Marîana Macbeth hwd. axaftinên wan wek axaftinên rojane yên kurdan bûn. Gelo we di qerekterên wek ên Dulsînea Sanco Panza û Don Kîşot de guherînên çawa çêkirin?**

Spas ji bo vê pirsê ku ez jî dixwazim di vê mijarê de nêzîkatiya xwe bêjim. Mijara wergera lîstikên biyanî mijareke girîng e. Dema ez hewl didim ku şanoyekê amade bikim, ez li mijarê digerim ku mijar çiye, çawa ye li gor ziman çand û naveroka kurdî ye an na? Ew berhem çi ji me re dibêjin, armanc û meqseda wê çiye? Ez li van aliyên wê tevan mêze dikim. Piştre dubare li berhemê mêze dikim ku eleqeya wê bi me re heye, tune ye, hebe çiye? Yanî dema ku lîstikeke biyanî were ser dika şanoya Amedê gelo dê çi ji bîneran re bibêje, çi bide wan, der barê wan de dê çi bibêje, ez li van aliyan tevan mêze dikim. Hewce ye derdê berhemê û derdê bîneran jî yek be. Jixwe ger ne wisa be tu qîmeta berhemên wergerê jî dê tune be. Ne ew e ku em tenê wergera Shakespeare bikin û çi ye gelo me ji Dario Fo, Shakespeare û bêvankes werger kiriye! Tiştekî ku derheqê me de tu tiştî nebêje, xîtabî me neke em ê çima bînin ser dikê! Em dixwazin xwe ji tariyê xelas bikin xwe îfade bikin, tiştekî vebêjin. Loma jî Don Kîxot jî li ser wê prensîbê me çêkiriye.

Wextekî dema ez dihatim û diçûm Amedê min ferq dikir ku navê Don Kîxot di kuçeyên Amedê de tim derbas dibû, li gelek cihan em bibêjin li ser dîwaran wêneyên Don Kîxot xêz kirine û di zimanê rojane de jî tim peyva 'Don Kîxotiyê neke' derbas dibû. Vê yekê bala min kişand û kir ku ez dînîtiya Don Kîxot bînim ser dika şanoya kurdî.

**Li ser Sancho Panza jî dixwazim tiştekî bipirsim. Niha Panza di romanê de wekî karakterekî ku gelek gotinên pêşiyan ji ber kirine tê nîşandan. Ji bo qerekterê Sancho Panza mirov dikare bişibîne kalekî kurdan (ku gotinên pêşiyan ji ber dizanin û çîrokên xwe ligser peyvê ava dikin)?**

Di vê pêvajoya provayan de jî hewldana me ew bû ku di her karakterekî de em li mirovekî xwe geriyan. Sanchoyê me kî ye, Dulsîneaya me kî ye, Don Kîxotê me kurdan kî ye û yekî çawa ye? Ji bo min Don Kîxotî çûyîna li dû dilê xwe ye. Klameke Şakiro heye dibêje "nizanim balîfa min kevir be tenê dilê rezîl bi dil be". Don Kîxot jî ew kesê ku di vê gotina Şakiro de, li dû xeyala xwe diçe. Ya Sancho jî hinekî ev e. Sancho û Don Kîxot dema digihêjin hev hinekî tiştekî cuda ne jî. Wek fikriyata yewnana antîk de çawa ku fikrê Dionysosî ( xwedawendê keyf, şereb, eşq û dansê ye) û Apollon (Xwedawendê hizrê, teorî û mantiqê ye) heye. Îcar li gor vê yekê jî hema insan jî di navbera her du aliyan de diçûn û dihatin. Bi gotina Geothe ev her dû serî ango fikr di dilê her insanî de dikin pirtepirt. Dilek li pey xeyalan diçe dilê din jî dibêje na ez ê rakevim. Yanî bi kurtasî di nava her mirovekî de Sanchoyek û Don Kîxotek heye. Mesela mirov di ciwaniya xwe de Sanchoyê xwe pir îhmal dikin. Em dibêjin hewce ye raketin tune be, em her bimeşin û bimeşin, hizirandin tune ye. Yanî hem pêdiviya me bi Sancho hem jî Don Kîxotekî heye.

Helbet ne tesadûfeke ku lihevkirinek wek Sancho Panza- kal û pîrên me were kirin. Mirov dikare di karakterên klasîk de gelek minakên ku çanda wan dişibe hev bibîne. Niha tu bi çavekî civakî lê binêrî ew jî tê de heye. Em dikarin bibêjin ku Sancho karakterekî me yê ji kalên kurd e, karekterekî ji gel e, dixwaze li zar û zêçên xwe mêze bike, li zevîyên xwe muhafazakariyê bike. Lê ligel vê yekê jî dide dû Don Kîxot û dikeve ser rêyan. Di berhemên ez çêdikim de dixwazim ku her bînerek tiştekî cuda jê fam bike û her kesek li gor xwe, li gor civaka xwe û li gor kesayeta xwe encamekî jê derîne. Yanî hewce ye bîner jî xwe di lîstikê de bibîne da ku ji dikê tev lê bibe.

**Mijareke din jî ew e ku gelo qerekterên jinan ên di Don Kîşotê de li gor karakterên Shakespeare, Molîere, Darîo Fo û hwd. di asteke çawa de ne?**

Ya rastî ne di astek baş de ne mixabin. Ev lîstikên berê yên klasîk, di romanên klasîk û berhemên klasîk de em dikarin bibêjin ku karakterên jinan tim di asteke xirab de ango ji rêzê, bi mêzandineke teng hatine nîşandan. Hema mirov dikare bibêje ku di gelek berhemên klasîk de û bi taybetî jî di yên Shakespeare de nedurûstiyek heye di vê mijarê de. Nêrîn û helwestên ku ji aqilmendiya mêrane derketine holê, hene. Mînak Macbeth, Leydî Macbeth mirov dibêje qey serboriya Adem û Hawa ye. Macbeth pîr û pak e û ji ber jinekî bûye kujer. Ev nêzîkatiya di klasîkên berê de di ya Cervantesî de jî heye. Ya rastî ev jî mijareke ku mirov bi serê xwe bigire dest. Belkî min di serî de Don Kîxot hinekî wisa îdealîze kir lê belê aliyekî Don Kîxot heye ku tarî ye. Don Kîxot wek Siyabend e. Tenê ne lehengekî pîr û pak e. Humanîst e. Ji bo mirovan dikeve rê lê pir caran aqimendiya ku ew bi kar tîne aqilmendiyeke mêrane ye. Niha ev yek di nav çanda me de jî heye her çiqas ku di van rojên dawî de hinekî kêm bûbe jî hê heye û didome. Mêrê kurd, mêrê egîd te digo qey tenê mêr di nav civaka kurd de hene, navê jinan nedihate gotin. Hema qehremanî ya mêran e, ceng a mêran e rola jinan a di wê qehremaniyê de jî tenê avêtina laçika spî ye ku şer dide sekinandin.

Vêca di meselaya Don Kîxot de carinan qehremaniyeke bêsebeb û bêtişt dike. Kesayeta Don Kîxot binketinê jî qebûl nake. Mînak Don Kîxot dikeve erdê û dibêje ez mirim. Ketina erdê ji mirinê xirabtir dibîne an jî wek têkçûyînê dihesibîne. Yekî wek Don Kîxot çawa dê bikeve erdê! Vê yekê qebûl nake. Helbet ev çanda aqilmendiya mêrane ye. Don Kîxot çanda mêrekî ye jî helbet. Hewce ye em vê yekê jî ji bîr nekin.



### Ferhat Keskîn kî ye?

Derhêner Ferhadê Feqî (Ferhat Keskîn) di sala 1967'an li Çewligê hatiye dinê. Zaroktiya wî li Çewlig û Stenbolê derbas bûye û piştre jî berê xwe daye Almanyayê.Têkiliya wî ya bi şanoyê re li Almanyayê dest pê dike. koma "Teatira Botan" saz dike. Ji 1992'an heta 2006'an, weke lîstikvanê şanogeriyê di "Theater an der Ruhr" de cih digire. Di 2006'an de li Duhokê lîstika bi navê "Şahiya Xwînî" û di 2008'an de li Amedê lîstika Azîz Nesîn "Yaşar ne Heye ne Tune ye" derdixe ser sehneyê.



Reyhan Îke

# Bigirî Asê!

Li ser axa welatê me çîroka her tiştî heye. Çîroka baranê, keviran, heriyê, her kulîlkê û her zindiyan. Tu kevir tenê ne kevir e. Keç, kur, dayik, bab, hezkiriya kesekê ye wî kevirî bi wate dike. Ya reng daye her kulîlkê xwîna yekî pir hatî û tê hezkirin e. Her çemekî me, lorîkekê dibêje. Bi kul û kovan in rûbarên me. Her çiyayekî me efsaneyekê di dilê xwe de hildigire. Yar û welatê bindestan in. Her kanî rondikeke çavan e li ser vê axê. Hêvî ye, bawerî ye; vîn, xweragirî û berxwedan e ya giyan dide axa me û ev ax rûyê me yê rast e; nexşeya dilê me ye ev ax, ma kî bi qasî me dizane vê rastiyê?

Çîroka ez bêjim jî çîroka Asmîneke vê axê ye; dîmenek ji jiyana zarokên welatê me, hewar û gaziya dilê dayîkekê ye. Roja pêncê hezîranê bû; Wargeha Mexmûrê ji aliyê firokeyên bêmirov ên dewleta tirk ve hat bombebarankirin. Bombe li pêş deriyê parka di navbera dibistanên wargehê de teqiyan û wekî mezinan zarokan jî şahidiya kujeriya dewleta tirk kir. Asmîn jî zarokek ji wan e ku hêj temenê wê heft salî bû. Ev nivîsa min naveroka gotinên dayika wê ye.

Destpêkê dengek hat, gurmîniyekê deng veda li hişê wê. Asê bi deng re wekî kulîlkeke lavlavê ya li ber tava havînê ya nîvro çilmisî. Birûskên tirsê komkirin ewrên çavên wê. Paşê toz û dûkêlek mezin bilind bû; hinek din xwe guvaşt ser hev di hembêza dayîka xwe de û lerzê xwe gihand lêvên wê. Firokên cengê li baxê zarokatiya wê mirin barandibûn û dîmenek tirsnak xuya bû li pêş çavên wê. Qîr û hewar bi Asê ketibû û agir ketibû nava cergên dayika wê û wiha gazî kir:

"Bigirî xunçegula dilê min. Asmîna çolê bigirî. Bigirî heta hişê vê serdemê di rondikên te de şarav bibe keça min. Bigirî bila edawên wijdanên rizî yên şerxwazan bi rûbarên rondikên te bên şûştin. Bigirî berxa min… li beramber heyîna bêdadiyê, bêmafiyê, zilm û zordariyê, herî zêde jî ji heyîna koletiyê bigirî delala min. Ne şerme tu bigirî Asê. Lê, şermê jî bizane xunava li ser perikê dilê min."

"Bizane keça min; ya şerm şer e, kuştin e, talan e. Ya şerm çavên te yên dexelî bi tirsê avdan e. Ya şerm bêdengiya li beramber van tevan e. Rihê kirêgirtî, hişên dagirkiriyê şerm e keça min. Bigirî heta awirên te dibin birûsk û vê deqa reş a li eniya mirovatiya wê çaxê dikole û tune dike bigirî. Ji bo vê mirovatiya mirî jî bigirî keça min. Li ser şîşan û nêrgizên li ser qebrên miriyan bibarîne rondikên xwe, qêrîna xwe bigihîne hinavên axê, bila asîman avis bibin ji hewara te."

"Bigirî delaliya diya xwe. Bila hemû kulîlk li ber rondikên te bibişkivin û bi hev re bigirîn. Çavê xwe bike bendavên rondikên hevtemenên xwe yên penaber in di dilê vê cîhanê de û li ser qesr û koşkên jiyankujan de berde; bila bibe tofan, di rondikên we de bixeniqin yên bi destên xwe yên gemar diqurçifînin temenên we."

"Bigirî xifşexezala min a li beriya Mexmûrê; bigirî û dilên bûne çolistan bi rondikên xwe av de keça min."


"Belkî şîn bibin û bibihîzin qiçeqiça dengê şewata hinavên dayika te, bibînin gêsnên jana bêçariyê yên dikêlin xetên rûyê babê te. Belkî pê bihesin di xewnên şevan de dêwên heftserî dimijin xwîna tiliyên hêviyên xuşk û birayên te û tirs û fikar konên xwe yên çardehstûnî datînin ser singa pêşerojên te."

"Bigirî kulîlka min a tovçiyayî ya di singa çolê de vebûye. Bigirî Asê; bila çiya di rondikên te de siqa bikin vîna xwe. Dilê xwe ji çiyayiyan re bike çeper, bila şerxwazan bikujin û bi destên şervanên çeperên rondikên te bên tunekirin hemû şer."

"Bigirî ku daristanên kezîbirî, balindeyên hêlîn şewitîn û ferxik lê mirîn, malên agirê kuçik û çirayên wan vemirîn, tirsonekên li ber zilmê û zaliman serî şor kirin, xayînên ji bo pariyek bermayiyên xelkê rûmeta xwe ji bîr kirin jî vejîn û raperîn di rondikên te de keça min."

"Bigirî keça min. Dilên ji hêvî, bawerî, hezkirin û evînan dêm mayîn jî av bide bi rondikên xwe û bila azadî li baxên jiyanê li ber kaniyên dilê te av bide Nêrgiz, Sosin, Beybûn, Binefş, Berfîn, Şilêre, Lîloz û Asmînan. Bigirî keça min; heta girî xwe bi rondikên te bişûn û tavên hemû sibeyan di kenê te de hiltên bigirî."





Ji Delav

Feratê Dengizî

# Reh û Rê

Çima dirêj in rê yan jî reh..!
Hema dibe ku naqedin, her û her dirêj dibin.
Bi ya min têkiliya wan xurt e.

Ji ber ku zimanê kurdî jiyanî û xwezayî ye, têkiliya peyvan û xisûsiyeta wan, naverok û şêweya wan, girêdana wan şîrîn, birqoq, beloq û berbiçav e.

Dema ku bi rêyekê ve diçim, wê gavê reh tê bîra min, rîh (rîh û rû) jî li aliye dinê. Lê îro derdê min bi rê û rehê re heye.

Rê û reh wateya jiyanê ne jî. Her kes, civak, kom, komik, azbet, eşîr, gel, netew û hwd. xwedî rê û rehekê ne.

Tê zanîn ku reh dar, giha kulîlk û her wiha riwekan bi erdê ve girêdidin û wan xwedî dikin, avê dikişinin bedena wan û tiştên ku wan xwedî dikin jî, wek mîneralan û her wiha, bi ser de dikin ku ew rast, nerm, libayî û tîk bisekinin û ji hewa û rojê jî sûdê wergirin, ne bes e xwarin û pêxwarinên ajal û mirovan jî amade dikin. Ev rewşa canlidarî ya zîndewarzanî ye.

Helbet her yek rêya wan jî heye, ber bi asîman ve (bi guliyên xwe) û li gor armanca xwe di wê rêyê de dibin simbilê genim, tirî, sêv, kulîlik, gul, gulçîn û her wiha. Bi saya dirêjiya reha xwe ku wan xurt dike (helbet bê kok, bê qurm nabe, girîngiya wê nayê înkarkirin, peywira qurm jî hêja ye, lê niha ew ne mijara me ye), berên şîrîn, xurt, hêja û giranbuha diafirînin.

Yanî reh û rêya wan bi diyalektîkeke hevpar afirîneriyeke pîrozî, vejeneke asîmanî, hêz û hêzek efsûnî radigihînin ku mijara hezar hest û zanînan in, ji bonî hebûnê, ji bo rengîniya jiyanê.

Îja ev rewş li civak û her wiha ji bonî gel û neteweyan jî derbasdar e ku ev mirov difikirîne.

Her civak xwedî rehên dîrokî, civakî, sosyalî, çandî, olî û her wiha zimanî ye. Jixwe bê ax û welat nabe. Ev reh mirov di civaka xwe de bi jiyanê ve girê didin. Orîjînaltî, xweserî, xweyî û xwebûna her civakê li gorî xwe û her wiha bi cîranan, bi xak, xweza, çand û rewşa hilberînê ve girêdayî ye. Ev yek diyalektîka jiyanê ye. Îja ku ev ahengsazî ev diyalektîk xerabibe, dejenerebûn, jixwedûrbûn, bîyanîbûna xwe dertê holê, kesayet û jiyan dibe keratî, na welleh dibe kafirkeratî ku mêtingerî, dagirkerî, serdestiya bi her cureyî sedemên vê ne.

Di vê mijarê de rista axê yanî welat serekeye. Bêheq **Ibn-î Xaldun** negotiye *"ax, erdnîgarî qeder e."* Û yan jî wek ku **H. Kıvılcımlı** dibêje; *"mirov berhemê erdnîgariya xwe ye."* Herê bandora xak, derdor û war diyarker e. Rewş, derûnî, çand û sinc; deşt, berî, çiya, bejî, avî, gundî, bajarî, cotkarî, koçerî û her wiha dirûvê didin mirov û ziman, çand, xwerûtî, cewherî, xweserî û şêweyê. Civak wisa dirûvê digire û cudatiya mirovan jî, li ser bingeha ziman rewşa gelan derdixe holê. Jixwe çand û derûniya bi hev re jiyan, xwesteka bi hev re parvekirina jiyanê ya li ser esasê gelîtî, gelan û çand û jiyana wan dikemilîne, dixemilîne.

Me go reh, Rêzdar **A. Ocalan** vê têkiliyê wiha zelal dike, *"mirov ne li ser koka xwe, ne xwediyê rehên xwe be, diçilmise, bêhêz, bêkes û ne xwediye kesayet û nasnamê ye. Bi rehên xerîb mirov dibe xerîbe-î hîlqat, yanî tiştekî xerîb, dermirov. Xwediyê rehên xwe bin, bila hûn bêtaqet bin, bi reh û cewhera xwe bimeşin hûn ê bibin hebûnê esas î xurt."* **(Dahurînên 88'an)**

Dîsa Arjen Arî yê dilşewatê welat û azadiyê bêheq nabêje;

*"Çengeke ax didime te nav lê qedexe*
*bi lingan zilmê strayi Dersim e ew bi xwe*
*bilûr betal in li çiyayê wê*
*roj radizên şev şiyar in şer distirê di geliyan de"* **(Ev Çiya Rûspî Ne)**

Dibe ku bi heman peyvan an jî peyvên cuda gelek kes, ramankûr, zane û feylesof van tiştan tînin ziman.

Belê, ax wisa. Dîrok û çand di rêzê de ne, pê re aborî, bazar, ked, ruhê gelîtî ya jiyana hevpar û bi deme re veguherîna neteweyî. Bi zeman ango demê re veresan civakê jî vediguherîne. Ax, bi axê re jiyan, civak, tore, adet, çand û xisletên hevparî dibişkuvin.



Lê bindestî, axx! Bindestî! Bindestî zincîrek zingarî, stûxwarî; û helbet bi xwe re berxwedanê jî tîne. Lê ne hêsan e. Bi hezaran kul, keder, birîn û nexweşiyan diafirîne. Sêwîtiyek gelîtî, netewîtî dizê li ser xaka pîr î stembar. Pelên dîrokê di esaretê de bi zimanê serdestan dipeyive. Va dengê **Berken Bereh** vê şahdetiyê dike;

*"De ka himbêza xwe veke ey dîrok*
*qey te bêriya sêwiyên xwe nekiriye"* **(Pandomîm)**

Tew berxwedan ku ya kurdan be, ji salan, sed salan vir ve, ax bi xwînê distirê û giyan difûrê li her alî, mîna xunava biharê, li ser vê xaka qedîm, li kevana zêrîn. Kurdistan, axa şehîdan.

Didome **Berehî**;

*"bibihîze denge xwîna min a ku diqerise"* **(Ji Dûriyê Re)**

Li vê xakê jiyan berxwedan e û berxwedan jiyan e; zilm jî wisa dibare ku her navê genî lê tê. Dîroka bi lehnet, genîtiya bindestî û xweşûştina şoreşgerî her dem di şer de ne. Rê ev e, dirêj e, belkî ji rehan dirêjtir, jixwe kok-qurm her tiştî di xwe de dicivîne, dihewîne. Lê serdest, mêtinger her û her dixwaze te, reh û dîroka te bi her awayî tune bike û rêya te şaş û şolî bike. Her cure tundiyê, wehşetê û çeken hovane bi kar tîne û ku navê te, bermayî û hebûna te wenda bibe. Em binêrin, vê rewşa hovane çawa dilê **Fatma Savcî** ya nazenîn, diltenika şervan çawa êşandiye;

*"gula li rûyê kevir neqişandî şewitandin"* **(Bîra Birînê)**

Na. Dilê wan hênik nabe bi kuştin û tunekirina me; Newala Qesaban, bîrên asîtê, komkujî, kuştina spî -bişaftindikin nakin, xewn û tirsa wan hebûn û berxwedana me ji xewn û xeyalên wan naçin, dilê wan nafirike. **Savcî**yê xweş diherikîne vî çemê derdan;

*"em di bin barana xwîna straneke kindar de ne*
*li ser rihê zeman*
*ji qedera me re*
*ayetên hezar Enfal'an xwendine"*
**(Bîra Birînê)**

Tew niha, di her azanê de *"Ayeta Fethê-Fetih Suresi"*, ne bes e piştî eşaye îja ayetan li ser hev dixin rêzê, bawer im em ê ruhên wan her û her bixin nav ezabê. Dikin nakin rehet nabin, bi nexweşiya Dehaq, bi Dehaqiyê ketine. Çare Kawa ye û pêk tê.

Vaye **Ehmedê Huseynî** li ser rehê rêyê zelal dike;

*çiya bangî deştê kir,*
*kobanê bersiv da şengalê:*
*li vir im*
*li vir im*
*li vir im*
*navika azadiyê dibirim*
*bi baskên xwînê*
*dê ber bi te ve bifirim..!*
**(Kobanî)**

Her wiha em ê li rehê xwe miqate bin û di rêya xwe ya rohnî de bimeşin. Bila ew bi hawarkin û her çavxwînî bin. Rehên me di kûr de ne û di dirêjiya dîrokê de ji aliyê her kesî ve tê zanîn.

Ji Gûtî, Qasîd Hurî-Mîttanî û Medan, Kardoxan vir ve şahid û şihûd ne kêm in. Kawayê Hesinkar û jinên berxwedêr al spartinê Kawayê Hemdem, Egît, Zekiya û Leylayan; Baba Tahir, Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û Feqî û hevrêyên wan reh xurt kirine bi her awayî û rê rohnî ye, îro bi hêza pênûs, Ferîşte û Milyaketên Çiyê hez û hêza me her diçe, li gel xemgînî û dilêşan, zêde dibe, her diçe em dibin **"xwe"** û bi mirovahiyê re mil bi mil in.

Bila rê û reha me qut nebe, rêya me neqede, sermedî be û reha me ziwa nebe, nerize, kurmî nebe û hişk nebe ku koka me ji xwe xurt e, hê xurttir û hemdem bibe ber bi ebediyetê ve.

# Agahî ji nûnerên Rojava tune

## Zêdetirî 20 rojan e agahî ji nûnerên Rêveberiya Xweser û endamên PYD'ê ku li başûrê Kurdistanê ji aliyê hêzên girêdayî PDK'ê ve hatibûn binçavkirin, nayên girtin

Ev zêdetirî 20 rojan e nûnerên Rêveberiya Xweser û endamên PYD`ê ji aliyê hêzên ewlehiyê yên PDK`ê ve hatine girtin û heta niha tu agahî ji wan nehatiye wergirtin.

Di 10'ê hezîranê de nûnerê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yê Hewlêrê Cîhad Hesen, endamên Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Mistefa Xelîl û Mistefa Ezîzî ku xwestin biçin balafirgeha Hewlêrê mêvanên xwe peşwazî bikin ji aliyê hêzên girêdayî Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ve hatin binçavkirin.

Ji wê rojê ve tevî bangewaziyên Rêveberiya Xweser û PYD`ê heta niha hêzên ewlehiyê yên girêdayî PDK`ê cihê girtina wan aşkera nekiriye.

Daîreya Têkiliyên Derve ya Rêveberiya Xweser di roja yekemîn a girtinê nûneran de daxuyaniyek dabû û tê de ev tişt gotibû: "Ev girtin nakokiyê zêde dike û diyalogê lawaz dike. Em hêvî dikin ku aliyên başûrê Kurdistanê di vê pêvajoya hesas de bi projeyên dewleta tirk neyên xapandin ku hewl didin şerekî birakujiyê derxin û gera veguherîna dîrokî ya doza kurd asteng bikin."

Rêveberiyê di daxuyaniya xwe de banga aşkerakirina çarenûsa wan û serbestberdana wan kiribû.

Her wiha di 7'ê hezîranê de desthilata PDK'ê ciwanê bi navê Ciwan Ebdulkerîm El-Mihemed girtibû dema tevî dayika xwe ya nexweş bi armanca dermankirinê bi rêya deriyê sînor ê Sêmalka diçû başûrê Kurdistanê û heta niha çarenûsa wî jî ne diyar e. ***QAMIŞLO***



# Li Parîsê 250 kon hatin danîn

Li paytexta Fransayê Parîsê koçberên bêmal ji bo ku balê bikişînin ser meseleya bêcihûwarbûnê li ber Şaredariya Parîsê 250 kon danîn.

Komeleyên têkildarî mafê mirovan bal kişandin ser tijebûna stargehan û lezgînbûna rewşê destnîşan dikin.

Koçberên bêcihûwar li ber şaredariya Parîsê ji bo ku rewşê şermezar bikin kon danîn û xwestin ku derdê wan zû were çareserkirin.

**Bal dikişînin ser rewşê**

Di nav wan kesan de ku kon danîne malbatên afrîkî, zarok jî hene. Mirov bi vî rengî dixwazin balê bikişînin ser rewşa xwe ya giran.

Ji rêxistina civaka sivîl a bi navê Utopîa56 Kerîla Theurîllat da zanîn ku ji bo ku ji mirovên bêcihûwar re cih were dîtin ev 3 hefte ne daxwazê dikin û wiha axivî: "Em êdî nema dikarin ji nav vî karî derkevin. Me walîtiya herêma Parîsê agahdar kir lê tu bersiv neda me." Ew hêvî dikin şaredarî alîkariyê bi wan re bike.

Her wiha Mael de Marcelus jî ku ew jî ji Utopîa56'ê ye diyar kir ku polîtîkaya bicihkirinê ya sirgûniyan tercîheke bizanebûn e û diyar kir bi vê tê xwestin ku mirov li xwe zêde nekin. ***PARÎS***



# Omanê xwest dewleta Filistînê bê avakirin

Wezîrê Karên Derve yê Omanê Badr al-Busaidi, ji hevpîşeyê xwe yê Israîlê re got ku ew hikûmeta Israîlê ya nû bi hêvî ne ku gavên şênber biavêje û Filistînê dewleteke serbixwe ava bike û paytext jî rojhilatê Qudisê be.

Li gorî nûçeya ajansa dewletê ya Omanê (ONA) Badr al-Busaidi bi rêya telefonê bi Wezîrê Karên Derve yê Israîlê Yair Lapid re axiviye.

Berê bi navbeynkariya DYA'yê welatên Kendavê, Mîrîtiyên Erebî yên Yekbûyî û Behreyn bi Israîlê re peymana asayîbûyîna têkiliyê hatibû îmzekirin. Piştî van peymanan jî Busaidi di der barê têkiliya Israîl û Omanê de kêfxweşiya xwe anîbû ziman.

Lapîd dê hefteya bê bi awayekî fermî biçe serdana Mîrîtiyên Erebî yên Yekbûyî û konsolosxaneya Israîlê li Abu Dabî û Dubaiyê veke. Piştî sazkirina têkiliyên dîplomatîk yekem car dê wezîrek ji Israîlê ziyareteke fermî pêk bîne. ***DUBAÎ***

H. Halît Alaçati

# Helwesta PDK dibe sedema yekitiya kurdan!

Mijara yekitiya kurdan demek dirêj e di rojevê de ye. Hemû hêzên kurdan herî zêde di 2013'an de nêzîkî vê pêvajoyê bûn. Ev pêşketin di asta herî jor de encama hewildana Tevgera Azadiya Kurdistanê bû. Berî vê pêvajoyê di salên 2000'î de û heta 2013'an bi pêşengtiya şaredariyên bakurê Kurdistanê konferansên wêje, mûzîk, şano, ziman, sînema, jin, ciwan, nivîskar û rojnamegerên kurd pêk hatin. Hin ji van konferansan çend caran hatin dubarekirin. Bi heman awayî gelek mîhrîcan hatin lidarxistin. Van hewildanan hişmendî, nîqaş, lêhûrbûn, hest û ramanên kongreya neteweyî pêş xist.

Rola herî mezin jî ya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bû. Jixwe raman û paradigmaya hemû xebatan encama keda Ocalan bû. Ji bo Kongreya Neteweyî pêş bikeve Ocalan name ji Mesûd Barzanî re şand û xwest bibe Serokê kongreyê û pêşengiya gelê kurd bike. Li gel ku piraniya gelê kurd Ocalan wekî serok dibîne jî Ocalan bi armanca yekitiya kurdan ji vî mafê xwe feraxat kiribû. Ger Kongreya Neteweyî pêk bihata niha gelê kurd li çar perçeyan di merhaleyek din de bû. Lê mixabin ev yek pêk nehat.

Berpirsyarê sedema vê yekê Mesûd Barzanî bû. Ligel ku Ocalan qadek mezin li pêşiya wî vekir û derfeta serokatiya gelê kurd pêşkêş kir jî Barzanî nekarî vê wezîfeya dîrokî bi cih bîne. Ji ber ku hedef û armanca Barzanî ya yekitiya gelê kurd û Kurdistanê nîne. Hişmendiya wî û partiya wî li ser esasê parçeyekê, malbat û eşîrê teşe girtiye. Vîzyon û hişmendiya Barzanî ya serokatiya gelê kurd û pêşengiya kongreya neteweyî tune ye. Perspektîfa wî teng, malbatî û eşîrî ye. Xwedî bingeheke civakî, siyasî, felsefî û îdeolojîk nîne.

Nikare pergal û paradîgmayên cîhanî bixwîne û li gorî wê polîtîkayan pêş bixe. Bi vê perspektîfa xwe ya teng bû sebeb ku gelê kurd fersendek mezin winda bike. Heman hişmendiya Barzanî û malbata wî ya teng, paşverû, malbatî û eşîrî niha gelê kurd ber bi felaketek mezin ve dibe. Hişmendî û feraseta malbata Barzanî û partiya wan PDK'ê jî ji ya Mesûd Barzanî wêdetir nîne. Li pêşiya kongreya neteweyî, yekitî û hevgiriya gelê kurd û Kurdistanê bûn astenga herî mezin.

Niha em bên ser sernava vê nivîsê. Çawa dibe ku PDK û Barzanî di yekitiya kurdan de rolek giring dilîze. Ev jî îroniyeke siyasetê ye. Carinan hin bûyer bandorên berovajî dikin. Rewşa Barzanî û PDK'ê jî îro heman bandorê dilîze. Li gel hemû derfetan jî di yekitiya gelê kurd de rolek erênî, baş û qenc nelîstin. Li şûna yekitiya kurdan û hevgiriya partiyên kurdan, hevkariya dagirkeran tercîh kirin. Li cihê berjewendiyên giştî yên gelê kurd û Kurdistanê berjewendiyên malbat û partiya xwe hilbijartin.

Bi qasî ku nêzikî dagirkeran dibin, ew qas ji gelê kurd û Kurdistanê dûr ketin û dûr dikevin. Bi qasî ku siyaseta dagirkeran dimeşînin, ew qasî jî teşhir dibin. Bandora Barzanî û PDK'ê ya li ser gelê kurd di demên dawî de ketiye asta herî jêr. Li ser berteka li hemberî malbata Barzanî û PDK'ê gelê kurd li Başûr, Bakur, Rojava û Rojhilat ew qas digihîje hev. Îro PDK û çend partiyên girêdayî xwe li aliyekî û hemû partiyên kurdan li aliyekî ne. PDK û beşek elît a li derdora berjewendiyan hatine cem hev li aliyekî, gelê kurd li aliyekî ye.

Li dijî polîtîkayên PDK û Barzaniyan a bi dagirkeran re gelê kurd di astek jor de bûye yek. Ev rewş ji bo partiyên siyasî yên kurd jî derbasdar e. Her ku diçe zêdetir helwesta xwe ya li hemberî têkiliyên PDK'ê yên bi dagirkeran re tînin ziman. Li dijî daxwaza şer a PDK'ê radiwestin. Qasî di vê helwesta xwe ya dijberî kurdan de israr dike, zêdetir kurdan hêrs dike û li ser xeta azadiyê kom dike. Bi gotineke din bêyomiya PDK'ê bi bandorek berovajî kurdan dike yek. Lê ne bi qencî û başî. Bi hevkarî û nokeriya xwe vê bandorê dilîze. Xweziya PDK'ê ne bi hevkariya bi dagirkeran re ev bandor bilîsta. Xweziya bi xizmeta ji gelê kurd re û pêşengîkirinê ev rol bilîsta. Lê wekî tê gotin di her şerekê de xêrek heye.

Di hevkariya PDK'ê ya bi dagirkeran re jî pêşketina gelê kurd a di aliyê helwest, raman, rih û hişmendiyê de derket holê. Lê ev nayê wê wateyê ku kurd ji talûkeyê derbas bûne. Ji ber ku PDK niha hemû zengîniyên gelê kurd ên aborî di bin kontrola xwe de digire. Dê heta dawiyê van li hemberî gelê kurd bi kar bîne. Dê hewil bide heta dawiyê bi hêz û alîkariya ji dagirkeran digire hêviyên gelê kurd tune bike. Bi çapemeniya xwe ya bi pereyê feqîr û jarên kurd fînanse dike, hewil dide provokasyonan bike. Pir zelal derketiye holê ku êdî çapemeniya PDK'ê ji hêla îstixbarata tirk ve tê meşandin. Ji bo hûn rûyên çapemeniya PDK'ê fam bikin li vê lînkê binêrin. **(https://gazetekarinca.com/2021/04/eski-rudaw-calisanindan-carpici-iddia-anadolu-ajansina-bilgi-mi-sizdiriliyor/)**

Heman provokasyonan li ser kuştina pêşmergeyan jî dimeşîne. Wekî tê zanîn di 5'ê hezîranê de PDK'ê îdîa kir ku gerîlayên HPG'ê 5 pêşmerge kuştine. PKK'ê ev yek derewand û diyar kir ku ev provokasyoneke PDK'ê û Tirkiyeyê ye. Her wiha xwest ku heyetek serbixwe û pêbawer lêkolînê bike. Hem PKK'ê û hem jî çavkaniyên herêmî, pêşmerge û şahidên bûyerê diyar kirin ku wesayîta pêşmergeyan ji hewayî ve hatiye bombebarankirin. Ango dewleta tirk ew şehîd kirine. Lê PDK û çapemeniya wê bi israr xwestin PKK'ê sûcdar bikin. PDK xwest vê bûyerê bike hinceta êrîşên li ser PKK'ê û rewakirina hevkariya xwe ya bi Tirkiyeyê re.

Li ser zêdebûna rageşiyê ji parlementerên partiyên din ên Parlementoya Kurdistanê û Parlementoya Iraqê heyetek ji bo lêkolînê çûn cihê bûyerê. Lê çi bibe baş e gelo? Belê we rast texmîn kir. PDK'ê taktîkên tirkan baş ji ber kirine. Berî heyet biçe wesayîta hatiye bombebarankirin ji nişka ve winda bû. PDK'ê ji bo rastî dernekeve holê bermahiyên wesayîtê ji holê rakirin. Her wiha destûr neda ku heyeta parlementeran biçe cihê bûyerê. Parlementeran tenê karîbûn ji şahidên bûyerê agahiyan bigirin.

Parlementer Şayan Eskerî ku di heyeta lêkolînkirina bûyera kuştina pêşmergeyan de cih girtibû daxuyaniyek da û rastiya PDK'ê û hevkariya wê ya bi dewleta tirk re raxist ber çavan. **(https://twitter.com/h_orman_/status/1406312381609910274/photo/2)** Eskerî diyar kir ku êrîş bi hewayî pêk hatiye û tu eleqeya PKK'ê bi êrîşê re nîne. Heman agahî ji hêla endamên din ên lijneyê ve hate aşkerakirin. PDK ji bo bi alîkariya dagirkeran hêzên kurd ji holê rake serî li hemû lîstikan dide. Pêşmergeyên girêdayî xwe jî ji bo vê armanca xwe ya bêyom bi rihetî dide kuştin. Hem jî bi alîkariya dagirkeran û bi bombeyên wan.

Rûyê PDK'ê û hevkariya wê ya bi dagirkeran re qasî ku derdikeve holê pozîsyona wê ya astengkirina kongreya neteweyî û yekitiya kurdan jî qels dibe. Ev yek jî encamek pir zelal derdixe holê ku êdî divê kurd kongreya neteweyî, yekitiya kurd û Kurdistanê bêyî PDK'ê bifikirin û ji bo vê bixebitin. PDK êdî bi awayekî objektîf hêzeke Kurdistanî nîne. Heta ku vê politikaya xwe neguherîne jî nikare ji vê pozîsyonê xilas bibe. Mixabin tu niyetek PDK û mala Barzanî ya wiha jî nîne. Tişta xuya ew e ku mala Barzanî dê zêdetir û dildartir bikeve pêşiya dagirkeran û Kurdistanê bi wan bide dagirkirin.

# Rapora 'dikare di girtîgehê de bimîne' dan Ozkan

Desteya Tenduristiyê li şûna nexweşiya dil, tenduristiya ruh a nexweşê giran Mehmet Emîn Ozkan nirxand û rapora ku 'dikare di girtîgehê de bimîne' da wî



Girtiyê nexweş ê giran Mehmet Emîn Ozkan ê 83 salî ku li Girtîgeha Tîpa D a Amedê dimîne ji ber rewşa wî ya tenduristiyê xerab bû, di mehekê de 7 caran rakirin nexweşxaneyê. Ozkan ê bi awayekî dest kelemçekirî di dorpêça leşkeran de rakirin nexweşxaneyê, careke din birin girtîgehê. Herî dawî Ozkan ji bo rapora tenduristiyê bi wesayîta rîngê sewqî nexweşxaneyeke Xarpêtê hat kirin. Bi hinceta ku nexweşxaneya berpirs ya Amedê ye, dîsa şandin girtîgehê. Ozkan ê roja ku birin Xarpêtê û dîsa anîn girtîgehê birçî hat hiştin.

Hat zanîn ku Ozkan ê xetereya jiyana wî heye li ser serlêdana malbat û parêzerê wî, ji bo rapora tenduristiyê di 23'ê hezîranê de rakirin Nexweşxaneya Lêkolîn û Perwerdehiyê ya Gazî Yaşargîlê û li gel pirsgirêkên wî yên giran jî tenê tenduristiya ruhî hatiye nirxandin.

Desteya Tenduristiyê li gel rapora beriya niha hat dayîn a ji sedî 87 astengdar e û 'nikare di girtîgehê de bimîne' jî li şûna nexweşiya dil a Ozkan, tenduristiya wî ya ruhî nirxand, tedawiya psîkîyatrîst pêşniyar kir û rapora 'dikare di girtîgehê de bimîne' da Ozkan.


**Dê bibin ATK'ya Stenbolê**

Desteya Tenduristiyê, ji bo nirxandina nexweşiya dil a Ozkan ê 5 caran krîza dil derbas kir û 4 caran jî anjiyo bû biryara ku sewqî Saziya Tiba Edlî (ATK) ya Stenbolê were kirin da. Tê payîn ku dê Ozkan roja duşemê bibin Stenbolê. Hat zanîn ku piştî nirxandina ATK'ê ya nexweşiya dil wê Ozkan careke din paşve bînin Girtîgeha Amedê.

**25 sal in di girtîgehê de ye**

Mehmet Emîn Ozkan di sala 1996'an de li Mêrsînê bi îdiaya 'endamê rêxistinê ye' hat binçavkirin. Pişt re ji ber Fermandarê Cendermeyan a Herêma Amedê Bahtiyar Aydin ê di 22'ê cotmeha 1993'yan de li navçeya Licê ya Amedê hat kuştin, berpirsiyar hat girtin. Ozkan ji vê dozê hat darizandin û tevî ku gotibû îdia bê bingeh in û ew bê sûc e jî cezayê girankirî yê heta hetayê lê hat birîn. Ozkan 25 sal in di girtîgehê de ye û gelek nexweşî pê re hene. ***AMED***

# 'Tirkiye daxwaza dagirkirina xaka me dike'



Navenda Nûçeyan

Êrîşên Tirkiyeyê bi hevkariya PDK'ê ji 23'yê nîsanê ve didomin. PDK'ê piştî herêmên Metînayê hîn hêzên xwe yên taybet şandin herêma Çemçoyê jî. Ji vê yekê helbet armanc ew e ku di asteke herî bilind de alîkariya Tirkiyeyê bike da ku cihên gerîla dorpêç bike û wan neçarî şerê navxweyî bike.

Çemço herêmeke stratejîk e. Nêzî 30 sal in ku hêzên PDK'ê li herêmê tune ye. Lê niha PDK hêzên xwe şandin wê herêmê ku Metîna bi Zagrosê ve girê dide. Ev yek ji aliyê gelek siyasetmedaran ve jî wek kirinên 'provakatîv ên PDKê' hatin pênasekirin.

**Sekna hin peşmergeyên berê**

Li dijî sewqiyatên leşkerî yên PDK'ê gelek sazî, siyasetmedar, rêxistin û pêşmergeyan nerazîbûnên xwe tînin ziman. Heta niha gelek pêşmergeyên dêrîn û ji derdorên nêzî PDK'ê gelek bertek hatin nîşandan û ev bertek û nerazîbûn hê jî didomin. Gelek pêşmergeyên berê jî ji ber ku sewqiyatên leşkerî yên PDK ku dişîne ser herêmên gerîla, rexne dikin û dibêjin 'li şûna ku ez ê fîşekê biavêjim PKK'ê, biavêjim xwe û dev ji çekan berdim.'

**Li hember dagirkirina xakê**

Li rojavayê Kurdistanê jî berê hinan gelek kesan pêşmergetiyê kirine. Yek ji van jî Hesen Yûsif Mele Hisên e ku ji gundê Girasor ê Dêrikê yê rojavayê Kurdistanê ye.

Hisên ev tişt anî ziman: "Dewleta tirk li Sûriyeyê, Iraq û bakurê Kurdistanê, li başûrê Kurdistanê dixwaze dagirkirina xaka me dike. Divê em nehêlin ku dewleta tirk were ser xaka Kurdistanê û birayên me bikuje."

**Ji ber êrîşên dewleta tirk...**

Mele Hisên di berdawama axaftina xwe de da zanîn ku heke dewleta tirk bi balafiran pêşmergeyan bombebaran bike û pêşmergeyan şehîd bike pêşmerge jî divê li dijî dewleta tirk rabe û ev tişt anî ziman: "Dewleta tirk bax û baxçeyên gel bombe dike. Ji ber êrîşên Tirkiyeyê gelek ziyanên gundên li ser sînor çêbûn. Heke mala min jî li wir be balafirên şer ên tirk wê min bombe bike û min bikuje. Dewleta tirk bi hinceta PKK'ê gel bombe dike.

**Divê kurd bibin yek**

Mele Hisên got divê her kes li dijî dagirkeriya tirk bibe yek û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ji bo pêşî li dagirkeriya tirk were girtin divê em bibin yek. Heke em bibin kesek nikare li pêşiya me bisekine. Heke em nebin yek ew ê her tiştî bikin. Divê di navbeyna me û PKK'ê de şerê birakujiyê nebe. PKK û pêşmerge kurd in û bira ne. Divê dewleta tirk welatê me dagir neke. Heke em bibin yek dewleta tirk nikare tiştekî bike."

## 70 baregehên Tirkiyeyê hene

Yek ji endamên Lijneya Asayîşa Iraqê yê bi navê Bedir Ziyadî têkildarê planên Tirkiyeyê daxuyaniyek da çapemeniyê û wiha got: "Li gorî rapora me ya dawî 70 baregehên leşkerî û nuqteyên çavdêrî yên Tirkiyeyê li Herêma Kurdistanê hene. Plana wê heye bi dehhezaran leşkeran li wan baregehan bi cih bike."

Ziyadî ku li parlementa Iraqê daxuyanî da çapemeniyê got: "Tirkiye plan dike li baregeh û nuqteyên çavdêriyê yên li ser sînorê herêma Kurdistanê 20 hezar leşkeran bi cih bike."

Bedir Ziyadî her wiha diyar kir ku pêşî li êrîş û wê plana Tirkiyeyê girtin karekî hêsan nîne û pêwîst e hikûmeta Iraqê xwedî helwestek cidî be.

# Sendîkayên brîtanî bang li Tirkiyeyê kirin

Dewleta Tirkiyeyê di 23'yê nîsanê de li başûrê Kurdistanê dest êrîş û operasyoneke berfireh kir. Ji wê rojê û heta niha di çarçoveya van operasyonên artêşa dewleta tirk de li herêmê şer û pevçûnên dijwar bi awayekî bênavber didomin. Her wiha li dijî operasyonên dewleta tirk her ku diçe bertek û nerazîbûnên kurdistaniyan û civaka navneteweyî zêde dibin.

Têkildarî vê mijarê 16 sendîkayên brîtanyayî jî li dijî êrîşên dewleta tirk a li başûrê Kurdistanê rabûn û nameyek ji Sefaretxaneya Bilind a Tirkiyeyê re nivîsîn. Di nameyê de banga bidawîanîna êrîşên li ser başûrê Kurdistanê hat kirin.

Înîsiyatîfa Frêdom for Ocalan, Unite the Union, Usdaw, GMB Union û CWU jî di nav de gelek rêxistinên civakî yên sivîl ên brîtanyayî nameyeke hevpar ji Sefîrê Bilind ê tirk Umît Yalçin re şandin.

**Bikaranîna çekên kîmyewî**

Di nameyê de ev tişt hat gotin: "Ji ber êrîşkariya leşkerên tirk ku serweriya Iraqê û hiqûqa navneteweyî bin pê dike û êrîşî bakurê Iraqê dike, qetilkirina xebatkara HDP'ê Denîz Poyraz em gelekî bi fikar in, lewma dinivîsînin."

Sendîkayên brîtanyayî diyar kirin ku di êrîşên li ser başûrê Kurdistanê de dibe ku sivîlan zirar dîtibin, koçber bûbin û çekên kîmyewî hatibin bikaranîn û êrîşa li ser kampa penaberan a Mexmûrê bi bîr xistin. Di nameyê de wiha hat diyarkirin: "Li pêşberî van nûçeyan em matmayî man. Em bang dikin ku hikûmeta tirk tavilê operasyonên leşkerî yên li ser Başûr rawestîne, em bang dikin ku dawî li êrîşên ser navendên sivîl û êrîşên li ser Iraqê bînin."

**Bi rengekî bêeman êrîş dikin**

Sendîkayan êrîşa 17'ê Hezîranê ya li ser avahiya HDP'ê ya Îzmîrê û qetilkirina Denîz Poyraz bi bîr xist û ev tişt diyar kirin: "Têkildarî kuştina Denîz Poyraz a li avahiya HDP'ê ya Îzmîrê, tê fahmkirin ku ev bûyer ji aliyê endamekî rêxistina Gurên Boz a nêzî MHP'ê ve hatiye kirin ku hevkarê çalak ê hikûmeta Serokkomar Erdogan e. Di rewşekê de ku Serokkomar Erdogan û hikûmeta tirk bi rengekî bêeman êrîşî HDP'ê dikin, reş dikin û weke dijmin nîşan didin, rûdana êrîşên bi vî rengî ne cihê matmayîbûnê ye."

Di nameyê de doza girtinê ya li dijî HDP'ê û doza Kobanê ya li dijî HDP'yiyan hat bibîrxistin û ev tişt hat gotin: "Konfederasyona me 'Trade Union Congress' (TUC) zêdeyî du sal in ji bo berdana lîderê siyasî yê kurd Abdullah Ocalan û hevdîtina li ser pêvajoyeke aştiyê ya gengaz daxwaza civînekê dike, lewma vê nameyê ji we re dinivîsîne."

Sendîkayan diyar kirin ku li şûna civîn bê lidarxistin, bersiv jî nehatiye dayîn û xwestin hevdîtina bi lezgîn bê kirin. ***LONDON***



# Pênaseya çand û teknolojiyê


War Botan

**Êdî peyva teknolojiyê ji mekanîkê zêdetir, nermalavê/software û hişêçêkirî/artificial intelligence tîne bîra mirovan. Bi riya înternetê, ya herî dûr hatiye mala me û ber me. Hema bêje her aliyê jiyanê bûye çêkirî/sanal**

Dema çand tê pênasekirin, pênaseya wê hema bêje ji al û qalê jiyanê digire nava xwe. Lewra pênaseya çand û jiyanê gelek nêzî hev in. Her wisa ger her afirînerî parçeyek ji teknolojiyê jî be, têgeha teknolojiyê jî ne gelek dûrî çandê ye. Her berhema çandî an bandor ji afirandina teknolojiyê girtiye an jî bandor li afirandina teknolojiyê kiriye. Di pêşketina mirov û mirovahiyê de dîroka çand û teknolojiyê di heman çemî de herikîne. Herka wan ya hevrêtiyê ji ya tenêtiyê coştir û xurtir bûye. Carinan pêlên çandê rê li ber teknolojiyeke nû, carinan jî pêlên teknolojiyê rê li ber çandeke nû vekiriye. Bes di aliyê wendakirin, bişaftin û tunekirinê de teknolojiyê serî ji çandê standiye.


Bêyî em bikevin nava kronolojiya dîrokî, ji serdema mirov yekem car weke amûrekê kevir tûj kiriye û di jiyana xwe de kar aniye heya serdema me ya îro (weke serdema fezayê tê binavkirin) vê bandora dualî dom kiriye. Çawa bikaranîna kevirê tûjkirî weke çandekê tê binavkirin, di heman demê de çêkirin û karanîna wî jî awayekî teknolojiyê ye. Dibe di serdema me ya îroyîn de kevirtûjkirin weke karekî pir hêsan bê dîtin, lê bila ji bîra me neçe, ew kevir mîna mak û bingeha hemû amûrên birînê ye û di gelek qadên din ên jiyanê de jî hatiye bikaranîn. Ji roja me ya îro re rêkirina Marsê ya keştiyeke fezayî çi be, ger bê fêmkirin di wê serdemê de jî girîngiya wî kevirî jî ew bû. Yên yekem car ew kevir dîtin, an jî çêkirin, ji mirovên din jêhatîtir bûne. Di çanda nêçîrê, çanda darbirîn û hûrkirina tiştan, çanda çêkirina parêzgehekê...hwd. de bûne xwedî awantajeke mezin. Helbet vê çandê bandor li çanda rê û rêbazên jiyanê jî kiriye. Weke mînakeke biçûk, mirov dikare bibêje teqez bandor li çanda cil û bergan kiriye û ew daye guhertin. Êdî geh bi birîna reh û rîşalên daran be û ji wan reh û rîşalan raçîn û dirûtina cil û bergan be, geh jî bi kuştina sewalan û kevilên wan lixwekirinê be, çanda cil û bergan daye guhertin.

Di navbera teknolojiya berê û vê demê de gelek cudahî jî hene. Piraniya teknolojiya serdemên berê bi awayê mekanîk e. Çêker an jî yên bi kar anîne, piranî bi hêza laşî makîne û amûrên teknolojîk dane şixulandin. Bi serdema Şoreşa Sanayiyê re karanîna vê hêza mirovî kêmtir bû. Êdî makîneyan gelek kar û barên mirovan awayekî rutîn û leztir pêk anîn. Di serdema me de (s.s.20.), taybetî piştî çêkirin û pêşxistina combers/computerê gelek tişt di demeke kurt de hatin guhertin. Êdî peyva teknolojiyê ji mekanîkê zêdetir, nermalavê/software û hişêçêkirî/artificial intelligence tîne bîra mirovan. Bi riya înternetê, ya herî dûr hatiye mala me û ber me. Hema bêje her aliyê jiyanê bûye çêkirî/sanal. Ji bazar û bazirganiyê bigire heta perwerde û lêkolînê, heskirin û parvekirinê bigire heta mirov dikare bêje şerê mirovan jî ketiye ser vê cîhana çêkirî. Lewra çanda me ya rasterast têkiliyê jî ketiye ber sekerata mirinê. Her çiqas em bibêjin ev çanda me ye jî lê dema em baldarî li nifşên nû dinêrin û çavdêriyê li ser wan dikin, em dibînin êdî ev çanda em qala wê dikin ne çanda wan e. Dîsa ger em ji bo di serê me de zindî bibe mînakeke biçûk bidin, ji nifşên nû re ji bo serdaniya nexweşekê an jî mêvandariyekê ne hewce ye mirov here mala heskirî an jî naseke xwe. Bi riya amûrên têkiliyê (telefon, înternet) mirov dikare van karan bike. Hem dema mirov dimîne ji mirov re hem jî mirov kêmtir diweste! Yanî ji ber awayê mezinkirin û têgihîştina wan a di jiyana çêkirî de helbet heya derekê mafdar in jî. Lê bilêvkirina vê gotinê jî, ji kesên bi çanda têkiliyên rûbirû re mezin bûne gelek sosret û weke kemasî tê dîtin. Dibe rojekê ji bo vê çanda me ya rûbirûtiyê henekên xwe jî bi me bikin. Ev gotina min ne dûrî aqil û dîrokeke pêşeroja dûr e.



Bi pêşketina derfetên pêwendiyê re cîhaneke ji bilî cîhana me hatiye avakirin. Sanalîzasyonê em di her aliyî de kirine bengînê/muptelayê cîhaneke derveyî keftûlefta laşî. Ji bilî heyîna me ya fîzîkî, heyîneke din a paşê hatiye çêkirin û ji bilî jîngeha me ya fîzîkî cîhaneke din bi me dane avakirin. Belê! Her çiqas em bêjin em bi dildarî tev li vê dibin jî lê di rastiya xwe de ev bi me dane çêkirin, bes me hay jê tune. Ji ber di nav civakê de piranî kes û kom derbasî vê cîhana çêkirî bûne yên tev lê nebûne weke kêm û paşvemayî tên dîtin û ew jî bivê nevê tev lê dibin. Jixwe tev lê nebin dê haya wan ji gelek tiştan jî nebe. Me bivê û nevê jî dê ev rewşê bi awayekî kûrtir hîn pêştir bikeve û çanda nû xurtir bike. Heyama pandemiyê ev çanda nû demeke gelek kurt de gelek pêş xist jî. Bi gotina kalan 'jixwe kavil bû, mîrata teyrokê jî lêxist kire kambax'. Bi giştî mirov dikare bibêje teknolojiyê çanda me tune kir û li şûna wê çandeke din de avakirin. Ger em li dîrokê binêrin ev gazind berê jî hatiye kirin û xuya dike dê nifşên piştî me jî vê gazindê bikin. Ev rastî herikîneke domdar e.

# Rojeke dîrokî û peyamên du hilbijartinan



Kakşar Oremar

Li Îranê du hilbijartinên serokkomariyê û şêwira bajar û gundan bi dawî bûn. Li hinek bajar û herêman nîvgerm û li piraniya wilayetên din jî pêşwazî pir sar bû. Îbrahîm Reîsî bû serokkomar. Rêjeya beşdariyê ji sedî 48,8 bû ku di hilbijartinên 12 dewletên berê de qet rêje ewqas kêm nebûye.

Li pênc wilayetên rojhilatê Kurdistanê rêjeya herî kêm a beşdariyê careke din bi bîra Tehranê anî ku gelê kurd xwedî daxwazên xwe yên dîrokî û siyasî ye. Asta hişyariya gel di civaka Kurdistanê de bilind û heta daxwaza şêx, siyasetmedar û kesayetên naskirî jî nekarî xelkê ber bi sindoqên dengdanê ve bikişîne. Bandora banga partiyên siyasî, kesayetên serbixwe û torên civakî jî li ser biryara gel zêde hebû. Li wilayeta herî bêavedanî û xwedî rêjeya herî zêde a bêkariyê anku Sîstan û Belûçistanê ji ber fetwaya lîderê olî herî zêde gel çû û dengê xwe dane Îbharîm Reîsî.

Di hilbijartinên encûmen an jî şêwira bajar û gundan de jî gel nekarî hilbijêrên xwe yên rastîn bişîne şaredariyê. Kurd li hinek bajarên wilayeta Urmiyê xwedî stratejiyeke hevgirtî nebûn û xiyaneta hinek kesên kurtbîn bû sedem ku gelek kesên şereza û pispor neçine şêwira birêveber a bajar, herêm û gundan.

Bi giştî civaka Kurdistanê careke din li pênc wilayetên mezin peyamên siyasî-civakî dane desthilata li Îranê. Ev jî zindîbûna hişê civakê û li ser piyan mayîna gel dide selmandin. Hêviyên wan ji paşerojê re zêde ne.

**Encam û peyamên girîng**

Peyamên girîng li pey 42 salên temenê Komara Îslamî ya Îranê dîsa tirs û lerzeke mezin xiste dilê birêveberê wê sîstema antîdemokrat û xwedî yasayên ku bi ser jiyana xelkê de hatine sepandin:

- Pareke mezin ji dengdêran li dijî sîstema desthilatdar in, lê civak dema xwedî rêbazên şoreşgerî nebe, bêdengî jî nikare guherandinekê pêk bîne. Ji nêzî 60 milyon kesên ku dikarîbûn dengê xwe bi kar bînin, ji sedê 52 beşdar nebûn, lê hinek jêder vê rêjeyê zêdetir jî didin diyarkirin ku ji hêla rejîmê ve hatiye îlankirin. Yanî civak ji siyasetên siyasî, civakî û bi taybetî jî aborî yên desthilatê qehrî û dengê meşrûyetê nedane wan. Mixabin dengekî hevgirtî jî di navbera çînên civakê de nîne ku ji vir û şûnde yê çi bikin û çawa hêviyên xwe yên ji paşerojeke geştir di qada kiryarê de bibînin. Ji niha de yê çar salên dijwar li hemberî dewleta Îbrahîm Reîsî xwe bidin diyarkirin. Ger serhildan an jî şoreşek jî rû bide, hêza rejîmê a girêdayî sîstemê jî ewqas heye ku demeke sînordar li hemberî wan bisekine. Ev dijberî xwedî nasnameyeke medenî bû û pêre jî hakimên Tehranê xistin nava şokeke mezin.

- Ji niha de gelek pisporên biyanî, kurd û îranî di wê baweriyê de ne ku di vê hilbijartinê de hat xuyakirin ka li pey Seyîd Elî Xaminiyê kî yê bibe rêberê olî yê Îranê. Xaminêyî demek e ku nesax e û li pey bêhêzî, nesaxî an jî mirina wî şêwireke sê kesî yê li cihê wî rûnên. Reîsê heya niha berpirsê bilind yê dadweriyê bû, piştî ku dest bi karê xwe yê nû kir yên bibe birêveberê welat û cîbicîkarê yasayên parlemanê. Hingî ew dikare wê şêwira sêkesî hilbijêre ku dibe bi xwe jî cihê Xaminêyî bigire.

- Vê carê dengê hêzên ku dixwazin rejîm û sîstema heyî biguherînin bilindtir û mezintir hat xuyakirin. Çîna nîvhal xweş, gundî û karker heya berî çendekê hêzeke mezin a parastina rejîma Îslamî bûne, lê ji xeynî kes û rêxistinên siyasî li derveyî Îranê ew çîn jî ji ber fesadiya bêdawî ya îdarî, bêkarî û rewşa tevlihev a jiyanê bûne dijberê rejîmê. Ev yek êdî yê nehêle stratejiya wan ber bi pêş ve biçe. Pêngavên ku ji bo guherandina atmosferê civakê yê siyasî bêne avêtin jî carê heya du salên din ji dewleta Reîsî nayên payîn. Piştre belkî bi azadkirina girtiyên siyasî, rê li ber çêbûna partiyên din yên siyasî û hilbijartinên azad bikaribin temenê xwe hinek din dirêjtir bikin.

- Reformxwazên xwedî îdiayên guherandinên bingehîn rastî şikesteke dîrokî û tirajîk hatin. Sala 2021'ê di qiyasa bi her du hilbijartinên heşt salên berê re şikesta reformxwazan gelek giran bû. Çar sal berê Ruhanî wek kandidê wan bi 24 milyon dengan bû serokkomar, lê vê carê Himetî wek kandîdê wê hêzê tenê du milyon deng bidest xistibûn. Ji ber tevliheviyên di birêveberiya wan de nekarîn gel ber bi xwe ve bikişînin.

- Hêşta ne xuya ye ka dewleta Reîsî yê di birêvebirina siyaseta navxweyî û derve de xwedî kîjan pîvanan be an jî gelo ji ber kuştina hezaran kesan di havîna 1988'an de yê ji hêla welatên dinê ve bi kîjan pirensîbên siyasî-hiqûqî ve bête pêşwazîkirin.

**Sererastkirina rojeke reş!**


Lîderê kurd Simkoyê Şikak (1887 - 1930) kengî hatiye şehîdkirin?

Hinek kes û ragihêner roja 21'ê hezîranê 1930'î weke salroja rêberê qehreman Simkoyê Şikak didin diyarkirin, lê li gor raportên artêşa Îranê, hevpeyvînên ku min bi hinek şervanên Simko re çêkirine û jêdera herî zêde cihê baweriyê anku rojnameya 'The London Times' lîderê kurd êvariya roja duşemiyê 21'ê tîrmeha 1930'î bi komployeke ji berê de amadekirî li bajarê Şino hatiye terorkirin. Ez li vira wêneyê rojnameya 'The London Times' jî bi we re parve dikim ku ew şaşiya dîrokî êdî bi yekcarî bê sererastkirin.

'The London Times' di raporta xwe ya roja sêşemê anku 22'ê tîrmeha 1930'î de xebera terora rêberê kurd belav dike ku ew raport rojekê piştî wê rûdanê ji Tehranê bi rêya nûçegihanê wan yê Îranî hatiye amadekirin û şandin. Kesên ku nizanin an jî nikarin salnameya Zayînî û Hetavî bidine berhev dikarin ji kesên pispor bipirsin ka meha July a salnama Zayînî meha heftemîn e an şeşemîn?

Dubare bo zanîna we:

**1930 - July - 21**
**یسمش هب هجیتن**
**۱۳۰۹ ریت ۳۰ هبنشود**



Simkoyê Şikak li gor raportên artêşa Îranê, bîranînên serleşkerên ku di terorê de xwedî rol bûn, ragihandina Îranê a wan salan û rojnameya 'The London Times' roja duşemiyê 30 meha tîr a sala 1309'an a Hetawî li bajarê Şino bi awayekî namerdane ji hêla dewleta Riza Şahê dîktator ve hatiye şehîdkirin.

Hinek kesên qaşo lêkolîner tevî dîtin û şiroveyên ku min û çend kesên din ji wan re nivîsîn, dîsa jî li ser gotina xwe mukir in û 21'ê hezîrana 1930'yî weke roja terora Simko didin diyarkirin, lê şiroveyên me jî li jêr nivîsên xwe paqij dikin.

# 'Ganî hetê şorişgerî ê Kazimî nêro vîrîkerdene'

Embazê hunermendo şorişger ê Kazim Koyuncuyî Mehmedalî Bariş Beşlî seba embazê xo Kazimî vat: "Tena 'Çakêtê şîîrî' nîyo Kazim. Ganî lazîtîya ci, wayîrvejîyayîşê ci yê şorişgerî û çepgirîya ci nêro vîrîkerdene. Wexto ke merdim bi ziwanê şarî xitabê şarî bikero şar zî kê qebul keno."



"Eke ti şoriş bifikirî ganî ti aye gore bicuwîyê. Rayraşîyayîşê to cîya do bibo. Ti do yewna tewir nizdîyê dikandar û manawî bibî." Nê vatişî aîdê hunermendo laz Kazim Koyuncuyî yê. Mergê Koyuncuyî û hunermendo şorişger ê muzîkî ke bi nameyê 'Çakêtê şîîrî' û 'Domanê Behrê sîyayî yo asî' ameyêne zanayene Kazim Koyuncuyî sero ra 16 serrî derbaz bi. Koyuncu Unîversîteya Zanayîşî ya Sîyasalî ya Stenbolî qezenc keno la bado ke yew serrî waneno fek unîversîte ra vera dano. Koyuncu serra 1991î de wexto ke vilawekanê 1ê Gulane vila keno yeno destbendkerdene. Badê destbendkerdişî cuya ci êdî cîya beno û mektebî temamî vera dano û xo dano muzîk. Koyuncu 21 serrî ya xo de tewrê Alî Enverî de koma muzîkî ya bi nameye 'Dînmeyen' awan keno.

Koyuncu serra 1993î de tewrê Mehmedalî Bariş Beşlîyî awankerdişê koma 'Zugaşî Berepe' (Domanê Behrî) ê rockî de ca gêno. 1995î de albumê "Va Mişkunan" (Ma nêzanê), 1998î de zî albumê "Îgzas" (Şona) vet û îmza eşt xebatanê ercîyayeyan ê lazkî. Koma Zugaşî Berepe serra 1998î de vila bî û dima ra Koyuncu tena serê xo muzîk domna. Albumê yewine ê Koyuncuyî ke tena serê xo veto serra 2001î de vejîyeno. Serra 2002î de zî muzîkê dîzîya (Gulbeyaz) viraşt û çend beşê dîzîyî de zî kaykerd. Nê xebatanê ci ra dima girseya ci zêdîya û hetê herkesî ra ame zanayene. Koyuncu serra 2004î de albûmê bi nameye "Hayd" vet û peynîya serrî de nêweşîya rîşa merdimwere kewt.

**Tena muzîk reyde eleqedar nêbî**

Çiqas nêweş bibo zî fek muzîkî ra vera nêda û 33 serrî ya xo de çimanê xo dinya rê pada. Koyuncu 25ê Hezîrana 2005î de Stenbol de cuya xo vînî kerd û dewa Yeşîlkoyî ya pabesteyê qezaya Hopa ya Artvînî ke serra 1971î de ewja de amebî dinya, ame definkerdene. Koyuncu heta unîversîte Hopa de mend la heskerdişê muzîkî û unîversîte ci ant Stenbol. Koyuncu tena muzîk reyde eleqedar nêbi, eynî wext de problemanê ekolojik ê Behrê sîyayî û problemanê welatî reyde zî nizdî ra eleqedar bîyêne.

**Embazîya Kazimî**

Embazê Koyuncuyî Mehmedalî Bariş Beşlî ke awankaranê koma 'Zugaşî Berepe' ra yew o qala Koyuncuyî kerd. Beşlîyo ke tewrê Koyuncuyî yew unîversîte de wendo vat ke her çend ke Koyuncu rew cuya xo vînî bikero zî o bi kerrayê mîhenkî ê muzîkê Behrê sîyayî û wina dewam kerd: "Mi serra 1992î de bi rayîrê embazêk xo Koyuncuyî şinasna. Teknolojî sey nika nêbî. Cayê ke ma yewbînan dîyêne cayê fîzîkî bî. Unîversîte de ma çend reyan leqê yewbînan ameyî la Kazim zaf paxê mi nêkerd. Reyêk ez wexto ke unîversîte ra vejîyayêne leqê Koyuncuyî ameya. Waştêne telefonê Hopa bikero. Jetonê ci mird nêkerd. Mi zî jetonê xo da ci. Embazîya ma wina destpêkerd."



**'Ma bi ziwanê şarî xitabê şarî kerd'**

Beşlî dewamê ci de vat ke o û Koyuncu serra 1999î de hetê kome de yewbînan ra cîya bîyî û vat: "La embazîya ma dewam kerd. Heskerdişê ma ê yewbînan girêdayê kome nêbî. Ma bibî hemrayê yewbînan. Ez tirkî zî zana la ziwanê min ê dayîke lazkî yo. Wexto ke merdim bi ziwanê şarî xitabê şarî bikero şar zî kê qebul keno. Coka şar muzîkê ma qebul kerd. Herçî ra ver kamîya mi zî lazî yo. Ma hewl da ke mesajê 'Ma bi no kamî yewbînan verik bikerê' bidî ciwanan. Ma vana qey ma ser zî kewtî."

**'Hetê şorişgerî û çepgirîya ci'**


Beşlî tewr peynî wina vat: "Amacê ma tena ziwan nêbî. Çekuyê deyîranê ma de çinbîyayîşê merdimîye û problemê ekolojîk zî estbî. Ma nê mesajan bi lazkî vat. Merdim 5 deqe Koyuncuyî reyde ronîştêne û bade çend serran yewbînan bivînayêne zî o reyna sey embazo tewr baş ê merdimi têgêrayêne. Mi dorme ra zaf eşnawito ke vanê 'Kazim embazê min o tewr baş bi'. Kazim zaf xora bawer bi. Muzîk merkeze cuya ci de bî. Coka fek unîversîte ra vera da. Bi hîsanê xo muzîk viraştêne. Deyîranê ci de ilham estbî. Hema wina nêronîştêne û beste nêviraştêne. Hem bi vengê xo û hem zî bi enerjîya xo zaf biqabîlîyet bi. Bê Kazimî ge-ge cuye zaf zehmet bena. Tena 'Çakêtê şîîrî' nîyo Kazim. Ganî lazîtîya ci, wayîrvejîyayîşê ci yê şorişgerî û çepgirîya ci nêro vîrîkerdene." ***STENBOL***

# 35 hîkayeyê vîrusî: Zaîyatê pandemî

Merkezê Xeberan

Pinar Ogunçe raşteyê fabrîka, depo, sektorê xizmetî, asayîş, dermankarî, înşaat, kargo, berber, çapemenî, perwerde, posta, weşî, asin, akademî û seybîna xeylê beşan ra 35 kedkaran reyde sohbetêko derg kerda û netîceyê sohbetî de kitabê bi nameye 'Zaîyatê pandemî: Hîkayeyê 35 cuyan ê yew serrî' veta. Her yew hîkayeyêk de xêzê Murat Başolî esto. Nuştoxe destpêka vîrusî de dest bi pêvînayîşê kedkaran kerda ke o wext hema roje de hûmara kesê ke nêweşîya janê korona kewtêne se derbaz nêkerdib. Nuştoxe badê yew serrî reyna heman kedkaran reyde pêvînayîş pê arda û sohbetêko derg ê zerrî înan reyde viraşta. Xebatkarêk weşîye ke barê nêweşî tewr zêde înan ser de bi, badê yew serrî wina vat: "Vatişê ke sereye pandemî de seba xurtkerdişê koltixanê xebatkaranê weşîye ameyêne vatene 'Xebatkarê weşîye her çîyê ma yî' yew serrî ra dima peynî de mendî. Bawerîya mi bi sîstemê weşîye û pêroyê sîstemî kêm bi la nika çin a.

Serra yewine ya pandemî de tu sektorêk dewlete ra paştî nêgirewtî. Sermayedaranê girdan rê asanîya bace virazîya la merdimê ke nêeşkenê debara xo bikerê xokiştiş tercih kerdî. Xeylê esnaf û dikandaran îflas kerd. Komelê Tirkîya mîyanê deyn, şenikbîyayîş û feqîrî de yew serre vîyarna. Nuştoxe kitabê xo de bale ancena vatişê 'vîrus ma pêronan kerd yew' ser û vana ke zaf derbaz nêbî ke no vatiş bi tarîx.





Pinar Ogunç kam a?

Pinar Ogunç Unîversîteya Zanayîşî ya Sîyasalî ya Stenbolî de beşa Têkilîya Neteweyî ra mezun bîya. 22 serrîya xo de kovara xeberan de dest bi rojnamegerî kerda. 1997î ra nata kovar û rojnameyê cîya cîyayan de edîtorî, muxabîrî û nuştoxî kena. Cemîyetê Rojnamegeran ê Tirkîya 2008î de xelata roportajo tewr baş û Fakulteya Resnayîşî ya Unîversîteya Anqara serra 2015î de 'Xelata Vera Nêseyyewbînanîye' da Pinare.

# AYM do 1ê temmuze de qerar bido

Mehkemeya Qanûno Bingeyî (AYM) do muracatê parlementerê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) ê Kocaelîyî Omer Faruk Gergerlîogluyo ke parekerdişê xo yê medyaya sosyale vera cezaya zîndanî ci rê ameye birnayene, parlementerîya ci bi na mehne ra ame betalkerdene û dima ra ame tepiştene, 1ê temmuze de biercno. Bado ke 17ê adare de parlementerîya Gergerlîogluyî ame betalkerdene, 2ê nîsane de sereştişê keyeyê ci virazîya û erşawîya zindan.



Gergerlîogluyî betalkerdişê perlementerîya xo ra dima muracatê AYMyî kerd. AYM kombîyayîşê xo yê 9ê hezîrane de qerar da ke muracatê Gergerlîogluyî bierşawî Heyetê Pêroyî yê AYMyî. Heyetê Pêroyî yê AYMyî do 1ê temmuze de muracatê Gergerlîogluyî biercno û qerar bido. ***ANQARA***

# Sancar: Embazanê ma rê dafika Dewaya Kobanê ameye ronîyayene

Hemserekê Pêroyî yê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) Mîthat Sancarî aktîvîteya 'Seba edalet û raştîye canî yenê yewca' de Dêrsim de elewîyan reyde ronişt. Aktîvîteya ke otêlêke de ameye kerdene, wekîlê HDPyî, temsîlkarê rêxistinanê komelê sivîlî, Şaredarê Dêrsimî û xeylêk hemwelatîyî tewrê ci bîyî. Aktîvîte de fotografê Seyîd Rizayî salone de ame akerdene.

Aktîvîte seba Denîz Poyraze pê deqayêkê rêzgirewtişî dest pêkerde. Hemvervatoxa Komîsyonê Şaran û Bawerîyan Tulaye Hatîmogullari îfade kerd ke ê seba heq, edalet û azadîye ameyî pêser û ard ziwan ke ê do pê hîşmendîya Seyîd Riza û Fatma Ana vera bêedaletîye vinderê.

Dima ra Mîthat Sancarî qisey kerd û vat: "Edalet, raştîye û heq esasê bawerîya elewîyan o. Ma Dêrsim de ameyî pêser. Çunke Dêrsim warê Seyîd Rizayî û ê dêrweşan o. Ma nika prosesêkê winasî de yê ke têkoşînê edaletî, azadîye û têdûştîye emser do vera hîşmendîya tekpereste, tedaker, qirkere fînal bikero. Eke ma nê rayîrî ra pîya şorê ma eşkenê na hîşmendîye çin bikerê. Elewîyî bi serran o




maruzê cîyakerîye manenê û tek waştişê înan têdûştîye ya. La wa şarê ma bizano ke heta ke azadîye û têdûştîye çinbê haştîye zî nêbena. Ma wazenê pêro bindestê nê welatî pîya têbigêrê. Wa çew nêvajo 'ez sey înan nîya, mi rê çîyêk nêbeno.' No sîstem rojêke ê kesî zî do qir bikero. Bêrê ma pêro canî bibê yew.

Derheqê partîya ma de dewaya qefilnayîşî esta, embazanê ma rê dafika Dewaya Kobanê ronîyaye, embazê ma yenê destbendkerdene, tepiştene. No sîstem xoza, nasname, kultur, ziwan û bawerîya Dêrsimî keno hedef. Edalet pawitişê nê nasname, kultur, bawerî û xozaya ma yo. Ganî ma seba pawitişê înan bêrê yewca.

Ma dewaya qefilnayîşê HDPyî de heta peynî partîya xo bipawê. Ma do qetî partîya xo fesîh nêkerê. Kokê HDPyî Koyê Munzurî de yo. Partîya ma dara ke pê awa nê kokan zergûn bena. Çew nêeşkeno na dare kokê ci ra biqerifna. Eke partîya ma bêra qefilnayene zî ma do têkoşînê xo rê dewam bikerê û şarî xo reyde mişawere bikerê. Rayîrê ma şima do dîyar bikerê.

Dêrsim hetêkî ra warê dejê Seyîd Rizayî yo la hetêkî ra zî warê xoverdayîş û têkoşînî yo. Coka ma nê şaristanî ra dest pêkerd. Ma şima ra fikr û îrfanê şima rîca kenê. Seke Seyîd Rizayî kursîya îdamî de vatbi 'Ez pê zûran û xîleyanê şima nêeşka, no mi rê derd bo la ez zî şima ver de çok nêşîya erdî ro, no zî şima rê derd bo.' ***DÊRSIM***




## ‘Ku em nebêjin xelas bûye xelas nabe’

Bi rastî jî ev gelekî ecêb û sosret e û her dem vê gotina xwe dubare dike û dibêje: “Heke em nebêjin xelas nebû xelas nabe. Anku hefsarê her tiştî di destê me de ye.” Dema mirov bala xwe dide hin kiryarên wan bi rastî ew li gorî wê rêbaza xwe ne.

Wekî mînak dema tûpê gazê xelas dibe, hinekî tûp dihejînin û kêlîkek be jî dihêlin ku vêkeve. Dema pîlên saetan xelas dibin, pîlan gez dikin dipelixînin û kêlîkek be jî dihêlin dîsa bixebite û dema ku şampuana wan diqede avê dixin nava wê, lihev didin û dîsa carekê pê serê xwe dişon. Lê di rastiya xwe de heke bikaribin sûdeke biçûk ji wan bigirin jî êdî ew xelas bûne û bi kêrî tiştekî nayên. Lê dîsa bi israr dibêjin Heke em nebêjin bi dawî bû, bi dawî nabe.



## Tiştanok (mamik)



**1-**Tiştek min heye
Dê hirhir
Bav zirzir
Kero bê qantir

**2-**Tiştek min heye
Deh li didoyan
Ser li qûnê
Qûn li erdê

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine . Bi hêvî ne ku bi dilê we be. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**
1-Hêsir, rondik 2-Bêrîvan

## Dem dema gêrê ye

Weke em hemû dizanin her malekê sermiyanekî wan heye. Rojekê ji rojan jîrkê malê ( sermiyanê malê ) pez û golikê xwe dibe sûkê difiroşe. Li nava sûkê digere lê dinêre canegayek werîs di stu de û di destê yekî de ye û bang dike; “Canegayê hêja! Canegayê hêja! Ê bikire poşman nabe?

Jîrkê malê li canegayê dinêre û di dilê xwe de dibêje: “Bavo çi canega ye, wek dîwarekî ye bi qesema navê Xwedê ez ê wî bikirim.” Hêdî hêdî diçe cem.

Xwediyê canega ew jî di dilê xwe de dibêje: “Ev ê were canega bipirse emrê wî derbas bûye, ji tiştekî re jî nabe. Ez erzan bibêjim ev ê nekire ez ê biha bibêjim bila bala wî bikişîne lê bi Xwedê ew bibêje çiqasî jî ez ê bidimê xwe jê pak bikim.”

Hîna wer dibêje, jîrkê malê tê û dibêje: “Selamû eleykûm, tu bi çi qasî vî canagayê xwe difiroşî.” Pereyekî zêde lê dibire, dibêje: “Canegayê min ê dolê ye!” Di ber hevûdu didin, jîrkê malê dawiyê dibêje ewqas pereyê min heye tu didî ez ê bikirim tu nadî jî malê te ye. Xwediyê canaga ji duh ve razî ye û dibêje; “Ez dilê te ji xwe nakim û dilê te qetî ye û bila çavê xwarziye min li dû nemîne min da te û xêrê jê bibinî”. Xwe direjî pereyan dike, dixe berîka xwe û werîs dixe destê wî û li dû xwe nanêre dimeşe. Jîrkê malê “Te pereyên xwe nejimart xalo!” dibêje. Xwediyê canega jî dibêje “Xwarzê ez te bawer im, oxirbe!”


Jîrkê malê werîsê canegayê xwe digire, berê xwe dide malê. Gelek wext derbas dibe, tê malê. Li hewşa malê disekine bavê wî li ser piyan “Tu bi xêr hatî lawê min, te canega çima kirî? Ma ev canega emrê wî derbas bûye nikare bimeşe.”Jîrkê malê dibêje: “Bavo ma em ji rêya dûr tên, ga betiliye bavo.”

“Ê de baş e lawê min, niha ez ê ji te du heb tiştan bipirsim” dibêje.

- “Ev canega ji gêrê re dibe?”
- “Na wele bavo nabe!”
- “Ev canega ji gêrê re dibe?”
- “Na wele bavo nabe!”
- “Ê te di gora bavo de nizam çi kiro, te ji bo çi anî?”
- “Bavo ez bi qesema navê Xwedê dikim ji gijgijê re êwelah e”
- “Tu yê min bibe pêşiya naxirê yan tu yê xwe bibî pêşiya naxirê, tu çêlekê me jî tune ne.”
- “Dem dema gêrê ye, Dem dema cot e...”

***Mehmet Devîren***

# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3. Roja em tê de 5. Pêvek, lê zêdek 7. Lehengê destaneke kurdan Memê.....
8. Pêş daçekek 9. Nazik, nazdar 13. Kul û xem 14. Ol
16. Paşnavê helbestkarekî kurd Arjen..... 19. Paşnavê helbestkarekî kurd Osman.
20. Notayeke muzîkê 21. Ne zuha, hêwî 22. Hiş, her wiha çala avê
25. Ne nêr 26. Arvanê ku bi avê tê vestirandin 28. Meheke havînê

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Ne îşev ya berê wê
2. Bajarekî rojhilatê Kurdistanê
3. Rojeke hefteyê
4. Dînî
6. Rasterast, an jî candar
10. Paytexta Sûriyeyê
11. Hemwelatiyê Îranê
12. Îca, ji niha şûn de
15. Awaz
17. Sewalên li malan tên xwedîkirin, ne bejî
18. Qirêj, gemar
20. Dema ku ava zêde radibe û diherike
23. Alî
24. Kar û xebat
27. Notayeke mûzîkê

Bersiva hefteya borî



# Dîroka peykeran

**Peyker yek ji hunerên herî kevnar ên li cîhanê ne lê nayê zanîn ka ev huner ji kîjan demê ve dest pê dike. Lê di kifşên arkeolojîk de, di dema şikeftan de rastî şopên hunera peykeran tên**

Hogir Ar

Peyker yek ji hunerên herî kevnar ên li cîhanê ne, lê nayê zanîn ka ev huner ji kîjan demê ve dest pê dike. Lê di kifşên arkeolojîk de, di dema şikeftan de rastî şopên hunera peykeran tên.

Yek ji nimûneyên ewil ên hunera peykeran, Venus of Willendorf ji ber ku li gundekî Awusturyayê tê dîtin navê gund lê dikin. Yek ji peykerên herî kevnare ye ku heta îro maye. Arkeologê awusturyayî Josef Szombathly piştî lêkolînên di sala 1908'an de li gundê Willendorf, diyar kir ku ev peyker bi texmînî 10.000 heta 25,000 salan berê hatiye çêkirin, peyker bi mezinahiya xwe 11 cm ye. Peyker îro li Muzeya Dîroka Xwezayî ya Viyanayê tê dîtin. Ew ji kevirê golikî-kilsînî (kirêç) hatiye çêkirin û ev kevir li erdnîgariya ku peyker lê ye, nayê dîtin.

Lêkolînerên dîrokî dibêjin, faktora sereke ku peyker aniye cîhanê, faktorê baweriyê ye. Peykerên yekem ên di dîrokê de tiştên mîna pûta e ku ji bo îbadetê hatine çêkirin. Ji ber ku herî yekem ji dar hatine çêkirin di nav rewşa xwezayî de têk çûne, riziyane.

Em dikarin bi sê çandên mezin ên peykersaziyê ku hunera peykeran çêdikin û forma wê ya îroyîn didomînin wisa bi nav bikin; peykerên misirî, peykerên grekî(yewnanî ) û peykerên romayî.

**Hunera peykeran li Misirê:** Herî zêde yên bi bîrdariyên goran û cur bi cur kesayetiyên olî dertên pêş. Peykerên Misirê yek ji dîroka herî kûr a peykeran e. Peykerên sfenks, yek ji mezintirîn peykerên cîhanê ne, bi sedsalan berê li Misrê hatine çêkirin.

**Hunera peykerên grekî(Yûnan) :** Hunera peykerên grekî li ser sê beşan tên dabeşkirin: Serdema kevnar, serdema klasîk û serdema helenîst.

- Di serdema kevnar de faktora baweriyê bingeha tiştên estetîkî yên sêalî ne ku di demên kevnar de bi bikaranîna kevir û hestî hatine çêkirin. Ev peyker bi piranî xweda û xwedawendên grek in.

- Serdema klasîk tê dîtin ku peykerên xweda û xwedawendan zêde bûne. Peykera herî navdar a vê serdemê peykera Athenayê ye ku ji diranê fîlan hatiye çêkirin.

-Di serdema helenîstîk de, gelek huner bi xêzên tûj dest bi teşedanê dikin û hunera herî navdar a vê serdemê peykerên serkeftî ne. Di serdema helenîstîk de, gelek peykerên serwer û lehengên şer temsîl dikin, bi girîngiya wan xuya ye ku bi terzekî realîst hatine çêkirin. Di nav xebatên navdar ên vê serdemê de navên wekî Venus de Milo û Menelaos û Patroklos hene.

**Li Romayê hunerê peykeran:** Romayiyan di hunera peykeran de peykerên grekan teqlîd kirine. Her çend di warê hunerî de têgihiştineke wan a orjînal tune bû jî di vî warî de wan cur bi cur berhem dan. Obodisk Theodosius li Stenbolê yek ji van kesan e û ji serdema Bîzansê ye.

**Di şaristaniyên Kurdistanê de peyker**

Îro, rojhilatê Sûriyeyê, başûrê rojhilatê Anatoliya (Tirkiye) û bakurê Iraqê navek e ku qada erdnîgariya dorpêçkirî vedibêje. Ew wekî navenda gelên îranî tê hesibandin. Kurdistan di grekiya kevnar de tê wateya "cihê navbera du çeman"μέσος ("di navbera") û ποταμος ("çem"). Ji du çeman mebest Firat û Dîcle ne, ji ber ku herêm di navbera van her du çeman de ye. Deverên ku Jor, Firat û Dîcle li beşa mayî ya Anatoliya, di (Şat ul Ereb) de dibin yek Kurdistana Jêrîn in.

Kurdistan, ji ber avhewaya vê herêmê di bin asîmanekî geş û bêewr de dijiya. Ji ber vê yekê, asîman li vî welatî bûye çavkaniya her cureyê ramanan. Her çend ji gelek aliyan ve welatekî paşvemayî be jî, di zanîna ezmanî, bîrkarî û dînî de ew gihiştiye encamên mezin.

Ev yek bûye sedem ku mîmariya Kurdistanê li ser bingeha mîmariya perestgehê ava bibe. Alûvyonên ku ji hêla çemên Dîcle û Feratê ve dihatin hilberandin mîna pelên axê bûn û ji bo afirandina berhemên hunerî ne guncav bûn. Wekî hunera Misirê di hunera Kurdistanê de qutbûnek çêbû. Li gorî arkeologan, ev bi xwe pêk hat, di encama lehiyeke mezin a li herêmê de derket holê. Şaristaniya kevn ji ber lehiyê wêran bû û di encama koçberiyan de huner û şaristaniyên nû derketin holê.

Sumerî, Akadî, Babîlî, Elamî, Ur-Urukî, Lagaşî û Nînewaniyên ku di salên 3000-4000 sal berî zayînê de dijiyan li vir bajarên mezin ava kirin. Ji ber ku wan kerpîç wekî materyal bi kar anîne, di navbera van bajarên mezin de peyker û rolyefên ji kevir hene.

Ji ber ku li Kurdistanê kevir hindiktir e, tiştên ku di goran de hatin dîtin bi piranî ji zêr û zîv hatine çêkirin. Bi xebatên ku wan li ser metal wekî rolyêfe çêkirine, reqemên nezîk û zûtir ên di nêzî wêneyên Misirî de, formên geometrîk hebûne.

Mirovên ku li Kurdistanê yekem karên hunerî fêmkirin Sumeriyên ku ji Asyaya Navîn hatin û li Kurdistanê bi cih bûn. Ji ber ku kevir kêm bûn, sumerî neçar man ku avahiyên xwe ji kerpîçên axê yên ku teşeyên rêkûpêk digirin bi hişkkirina wan li ber tavê di qaliban de çêbikin. Berikên hişk ên ku di tendûrê de dihatin şewitandin zêde nehatine bikaranîn. Bajarên sumeriyan bi dîwaran hatibûn dorpêçkirin û ji bo xwedayan perestgeh, qesr û xaniyên padîşahan hatibûn çêkirin.

Forma perestgehê ya herî girîng perestgehên bircê ne ku ji kerpîçên li ser hev hatine danîn, ku ji wan re ZIGGUART tên gotin. Ev teras bi nêrdewanan an rampan ve girêdayî ne. Perestgeh û qesra qraliyetê ya ku pêşiya mîladê 3000 salan e, ku li dijî herikîna çemî hatiye avakirin, ji gelek ode û korîdorên ku li hewşên bilind ên hewşên çargoşeyî dorpêçandî ne, pêk tê.

Sumerî, akadî, farisî, babîlî, aramî û suryanî, ji xeynî van, gelek gel û qebîleyên din li Kurdistanê pêk hatine. Hebûna Hîtît, Suryanî, Med û Pers li Mezopotamyaya Jor zêdetir e. Şaristaniya Ûrartû di kevnariyê de li bakurê rojhilatê Kurdistana Jorîn pêş ket.

**Peykerên sumeriyan**

Samarra, Halaf û Hasuna dikarin ji mînaka wargehên navdar ên serdeman, ji destpêka geşedana çandinî û jiyana gundewar bigirin heta derketina nivîsê bên dayîn. Ev dikare weke serdema Uruk were binavkirin (pêşiya mîlade 4000 sal pêşiya mîladê 3100 sal ). Di vê serdemê de, bajarên li başûr gelek pêşve çûn. Ur-Nanşe ku li Lagaş bû desthilatdar, bi çêkirina avahiyan hat zanîn. Urukagina jî bi saya reformên xwe yên yekem ên nivîskî hat naskirin. Perestgeha Enlil, xwedayê sereke yê Sumeriyan, li Nippurê bû, ji ber vê yekê Nippur weke paytexta olî ya Sumeriyan hate hesibandin. Pêşiya mîladê dema ku sumerî di salên 2400-2350 de kêm bûn, akadî zêde bûn.

Bi peykeran re celebê hevbeş rûyê qelew, çavên mezin, berçavên stûr û devek bi zexm girtî ye. Serê jinekê li ber çavan mînakeke xwerû ye. Piraniya peykerên ku îro derketine holê ji metalên wekî zêr û zîv hatine çêkirin. Wekî din, tê dîtin ku hunermendan karê xwe kirine zerikê dara-mîrkutê li asfaltê bi qîr nexş kirine Bi piranî, bejnên peykeran tazî ne. Cilên celeb-pêlav ji pêçek hûrik û stûr hatine çêkirin. Helwesta laşan pêş e. Ser rast in, destên xwe ber singê ve girê didin û çav bi nemaze mezin in. Ji ber ku ew li ser her beşê bi rengekî cuda disekine, nerazîbûn hem di peykerê de û hem jî li ser rolyefan tê dîtin. Ser û hêmanên wê (çav, poz, por, rû û hwd.) girîngtir hatine hesibandin û ling jî kêm hatine nirxandin. Bi teşeyekî zindî ne, lê di rewşeke qeşagirtî de ne û nêzîkê formeke geometrîk in.

**Peykerên babîl û asûran**

Dîwarên şer, nêçîr, ol an jiyana qesrê li ser dîwarên ku wan bi keviran an alabastera stûr çêdikirin û radikirin. Di piraniya van wêneyên alîkariyê de, rû û porê padîşah heye. Mirovên din ên dora wî dişibin hev. Dîmenên nêçîrê pir bi zelalî têne xêz kirin. Peykerên şêr an tîrên serê mirovan deriyên perestgeh û serayên aşûriyan diparastin. Hunera suryanî derbirîna leşkerî weke bingeh qebûl kiriye. Motîfên bi tîpa lehengan girîng bûne. Padîşah di celebê nêr de hêzdar têne nîşandan. Bedena werzîşvanekî masûlkeyên wan werimandî heye. Dîsa, çavên mezin, çavên stûr, pozê xurt û rûyê dirêj mijarên derbirînê ne. Çekên ku ew hildigirin ji tîr û şûrên dirêj pêk tên. Peykersazên suryanî ji bo xweda û padîşahan li ser mezinahiya xwezayî peykerên bîrdariyê çêdikirin. Girîngî li ser anatomiya laş û rêjeya di navbera deverên cihêreng ên laş de hatiye danîn. Hêz û enerjiyeke berhevkirî hem di xebatên plastîk ên belaş de û hem jî di alîkariyan de tê fêhmkirin. Di hunera plastîk a suryanî de, padîşah bi dua yan bi cejnên şer, êrîş, dorpêç, nêçîra heywanên kovî, serfirazî tê nîşandan. Style şêwaza embarên kevirî yên ku dîwarên qesrê dixemilînin realîst e. Dîmenên şer an nêçîrê bi tevahî di zemîneke rastîn de têne xuyang kirin. Di navenda besteyan de padîşah di mezinahiyek ji yên din mezintir e. Çiqas mirov û heywan ji padîşah bêne derxistin, ew hindiktir in. Ev nîşan dide ku ew bi pirsgirêka perspektîfê re mijûl dibin. Shaves peykerê suryanî di pêşandanên ajalan de herî serketî ne.



# Festîvala Fîlman a Cannesê dest pê dike

Juriya Festîvala Fîlman a Cannesê hate aşkerakirin. Wê festîval di navbera 6-17'ê tîrmehê de were lidarxistin.

Stranbêja ji Kanadayê Mylene Farmer, derhênerê fransî Senegalî Matî Dîop, aktorê fransî Tahar Rahîm, senarîst û aktrîsta fransî Melanîe Laûrent, aktorê ji Koreya Başûr Song Kang-Ho, senarîst û derhênerê ji Brezîlyayê Kleber Mendonça Fîlhoî, derhêner û senarîstê ji Awûstûryayê Jessîca Haûsner, derhênerê û senarîstê ji Amerîkayê Maggîe Gyllehaal di juriyê de cih digirin.

Jurî wê bijartina xwe ji nav 24 fîlman bike. Dê festîval ji aliyê Dorîa Tîllîer ve were destpêkirin û ji ber kariyera wê, ew ê Xelata Rûmeta Palmiyeya Zêrîn bidin Jodîe Foster.

Beriya şewbê di sala 2019'an de festîvala dawîn hatibû lidarxistin û fîlmê bi navê 'Parasîte' yê Bong Joon-Ho hêjayî xelata Palmiyeya Zêrîn hatibû dîtin. ***KANADA***






# Li Til Koçerê şanoya 'Beşa Sêyemîn'

Koma Şehîd Ezîz Ereb a navçeya Til Koçerê li navenda Çand û Hunerê ya Dêrikê şanoyeke bi navê 'Beşa Sêyemîn' pêşkêş kir. Koma Şanoya şanoyeke bi navê 'Beşa Sêyemîn' a Nazim Hikmet û bi derhêneriya Ebdulhadî Îbrahîm pêşkêş kir.Di naveroka şanoyê de mijar li ser keysbazkirina çîna xizanan e ku ji aliyê şîrketan ve tê desteserkirin û nirxên mirovahiyê tên hilweşandin.

Ebdulhadî Îbrahîm der barê şanoyê de axivî û wiha got: "Divê çînên xizan neyên keysbazkirin ku ev yek dihêle cudahî di navbera gel û civakan de li cîhanê çêbibe."

Koma Şehîd Ezîz Ereb di Mîhrîcana 5`emîn a Şanoyê ya herêma Cizîrê de 3 xelat wergirtibûn. ***DÊRIK***

xwebûn

28 Hezîran-4 Tîrmeh 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 80

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* Elif Can Alkan
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli
*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 *Yenişehir / Diyarbakır*
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Gaboxeyê cixirandî yê bihêrs; Zagros



Keştiya Alalû
Agît Yazar



Heke meriv vî rêzeçiyayî nola qumaşekî qermiçandî ûtî bike û li erdê raxîne, ka xwedê dizane bê ew ê nexşeya çend dewletan binuxumîne; hingê ew ê gelek dewletên tirtire di binê xwe de vegewixîne û bibe nola zarokekî gevçilandî ku di binê sakoyê bapîrê xwe de mabe bêhnfetiskî.

Silsileya kibêsên (kütle) çiyayê Zagrosê, nola xwediyên xwe yên kurd, serê xwe bilind kirine. Ew jî bi qasî xwediyê xwe rûspî û serbilind in.

Çiyayê Zagrosê, wekî rûspiyekî zanamend di navbera her çar deryayan de çarmêrkî rûniştiye. Hemû razên xwe yên xwedayî, wekî gilkevaleke çermînî di bêrîkên xwe de, ango di şarge û şikeftên xwe de veşartiye. Gava Zagrosê dêw bixwaze, lingekî xwe radimedîne dixîne li nava ava kendava Basrayê, lingekî xwe yê din jî radimedîne dixîne nava derya xezarê. Destê xwe dirêj dike, kulmek av ji Deryareş tîne. Destê xwe yê din jî dirêj dike, kulmek av ji Deryasipî jî tîne davêje ser çavê xwe û ji xilmaşiya hezarên salan hişyar dibe.

**Zagros bûye dergûş**

Çiyayê Zagrosê, hembêza xwe ji bavê me Adem û diya me Hewa re jî vekiriye û ew di dergûşa xwe de hejandine; di guhê wan de lorîkên nola pîşo nermik, lorandiye. Paşê ji keştiya Hz Nûh re bûye rawestgeh. Ji ajalan re ku di keştiyê de bûn bûye mêrgên fireh û çeregehên bêserûber.

Xwedê dizane keyê Gûtiyan yê yekemîn gava bi mezinahiya Zagrosan dihese zax tê wî; xwe qure dike. Paşê dirame ku ew jî bi qasî Zagrosan mezin e. Lema navê xwe datîne Kamasî/Gamasî. Ev nav, tê wateya 'gayê mezin'.

Keya Gamasî yê gewre B.Z di sala 2600'î de, hozên kurdan yên li çiyayê Zagrosan dijiyan gihand hev û dewleta Kurdan/Gûtî/Kur-tiyan ava kiriye.

Ev çiya, seraping ango seranser, bi razên xwedayî nuxumandî ye. Gelek lehengên cîhana dêrîn yên efsanewî, navên xwe li ser lat û zinarên Zagrosan kolandine, her wiha rolyefên xwe lê qewartine.

**Destpêka mirovahiyê li vir zîl daye**

Ji roja benîademiyan çavên xwe buşkuvandiye û vir ve, şopên mirovahiyê yên herî kûr li Zagrosan û derdora wê hatine dîtin. Di kevalên kîl de jî û di kitêbên pîroz de jî, eyan beyan qala destpêka mirovahiyê dikin ku tovên şaristaniyê li derdora çemên ji Zagrosê herikîne, zîl daye. Bêguman her du çavkaniyên dîrokî, ango hem kevalên kîl yên bi nivîsên mîxî hatine nivîsîn û hem jî kitêbên pîroz yên olî hemfikir in ku çiyayê Zagrosê û derdora wê, mahtika mirovahiyê ye.

Çiqas şan û şerefeke mezin e ku bavê me Adem û diya me Hewa çavên xwe li ser erdê dê û bavê me bişkuvandine.

Paşê zarokên wan çêbûne û li hev zêde bûne. Her ku tovên benîademiyan li hev zêde dibin, nerindî û xerabiyê bi serê hevûdu de tînin. Habîl û Qabîl cara ewil li vê derê xwîna hevûdu dirijînin. Werengî dibin kujerê xwîşk û birayê xwe, ji erdê Zagrosan tên sergum û afarozkirin.

Ev ehlên xerabiyê bi ku de diçin, dikevin li dû talana dewlemendiya li ser rûyê dinyayê. Ev newal yê min, ew gelî yê te! Diçin heta bi Çîn-Maçînê re jî derdikevin.

**Carnan li jor carnan li jêr**

Benîademî yên pêşiyên me, mirovên herî henûn, şîrhelal û bi wefa bûne; ew her û her li ser erdê kal pîrên xwe mane. Çiyayê Zagrosan tim û daîm stargeh û meskenên wan bûn. Carnan jî zivistanan daketine jêr, çûne germiyanan. Carnan jî dîsa li zozanê Zagrosê vegeriyane, derketine havîngehan.

Ew benîademiyên ji vê hêlînê bi firê ketin, çûn li devereke vê dinyalikê bi cih bûn. Her hinek ji wan, li gorî ax, av û hewaya erdnîgariya li ser dijiyan, şekil wergirtin û ketin kirasên wî welatî. Yên li Afrîkayê reşik, yên li Amerîkayê paxirî, yên li Skandînavyayê bozik, yên li çolên Erebistana qemer, yên li devereke din sor...

Hin ji wan çavşîn û porzer, hin ji wan çavhinguvîn û porkurîşkî, hin ji wan çavreş û porşurtalî. Hasilî kelam reng û dirûvên wan ji hev cuda bin jî, hemû ji yek dê û bavî bûn.

Li gorî vê rewşê, bê dudilî meriv dikare bibêje kurd, xwîşk û birayê mirovahiyê yên herî mezin û herî wefakar in.

**Di navbera deryayan de**

Heke dadgeheke adil pêk were (çi li gorî edaleta xwedayî, çi jî ya beşerî) erdê di navbera her çar deryayan de (Xezar, Basra, Deryaya Sipî û Deryaya Reş) milkê pêşiyên me ye. Ev erdê hanê yê min ew destnîşan kiriye, li me helal, nola çirrê şîrê diya me ye.

Ne ku ez ji ber xwe ve dibêjim. Hemû belgeyên dîrokî van gotinên min piştrast dikin. Hemû kevalên kîl yên heta niha hatine dîtin (ew keval, pênc-şeş hezar sal berê bi destê benîademiyan hatiye nivîsîn) tevdekên wan qala çiyayên me, qala çem û rûbarên me dikin. Her wiha kitêbên pîroz yên wekî 'wehî' ji hêla xwedê ve ji benîademiya re hatiye şandin jî qala heman tiştî dikin.

**Tîpa 'd' ketiye şûna 't'**

Di kevalên kîl de, şeş hezar sal berê jî navê me kur-tî bûye. Niha jî navê me kurd e. Zimanê me kur-dî ye. Ji şeş hezar sal û vir ve tenê tîpek guherî ye. Tîpa 'd' ketiye şûna 't' yê. Ev her du tîp, jixwe gelekî nêzî hev in û gelek caran cihên xwe bi hev diguherînin. Li gel vê yekê, ew erdnîgariya kal pîrên me tim û daîm lê bi cih bûne, hatiye destnîşankirin.

Lewma jî li ser rûyê dinyayê, wanî ti nimûneyeke din nayê dîtin ku miletek di nava demajoya şeş hezar salî de, heman navî bi kar bîne.

Beriya Zayînê çar hezar sal berê hozek ji Zagrosê, ji kur-tî'yan vediqetin û dadikevin xwe berdidin derdora cihê çemê Dîcle û Ferat lê digihêjin hev. Ji vê hozê re digotin Somer/Sumer/Sîmer/Sîmêr. Ev hoza ji kur-tî'yan veqetiya di nava demeke kurt de, bûn mûcîd û dahênerên gelek ilmên zanistî. Ji rojhilatê Zagrosan (parêzgeha Hurmuzganê, Kîrman, Yezd, Zahîdan, Xurasan, Gorgan û Raştê bigire heta jora Erzerom ango Deryaya Reş û ji wir jî bigire heta Sêwaz Çemê Halîsê, her wiha ji Çemê Halîsê bigire heta Deryaya Spî devera niha bajarê Antalya, ango qismekî çiyayên Torasan) tenê qewmên Kurtî lê dijîyan. Di kevalên Someran de hingê ev herêma li jorê hatiye destnîşankirin û gelê li vê herêmê dijiya jî wekî "kur-tî" hatiye pênasekirin.

**Qurrebûna me ji koka me tê**

De min li jor jî gotibû; çi kevalên kîl yên Someran, çi kitêbên pîroz yên bawerîyên yekxwedayî, çi jî cihwarên arkeolojiyê, van tesbîtên li jorê hemûyan piştrast dikin. Rastiya vê yekê, nola xeleka zincîrê wanî yek bi yekê ve gierêdayî ye. Çawa roj tê zanîn, çawa şev tê zanîn; ev rastî jî wanî tê zanîn. Lewma jî em çiqasî serê xwe bilind bikin, em çiqasî xwe bi esaleta xwe qurre bikin, em mafdar in. Lewra qurrebûna me, ji koka me ya qayîm tê.

Heke em vegerin li serê sedê, ango em li vê nivîsê vegerin û çend hevokên destpêkê di ber çavan re derbas bikin, ew ê zirr-mirovek mexrûr were li ber çavê me; mirovek di kirasê silsileya çiyayan de wanî çarmêrkî, li xwe re di navbera çar heb deryayan de rûniştî.

Xwînerên ezîz. Werin em hêdîka destê xwe têxin bêrîka sakoyê vî zir-dêwê razemend; şarge û şikeftên wî bipelînin. Ka em lê binêrin bê vî zanamendî, di bêrîkên xwe de tîtikên çawa ji neviyên xwe re veşartiye û heta roja me ya niha hilaniye.

Gava meriv ji bajarê Silêmaniyê wekî balindeyekî, 10 km ber bi başûrrojava ve hinekî bilind bifire, merivê biçe xwe li ser lateke bilind dayne. Ev lata bilind, li ser çiyayê Berananewe ye. Li binê vê latê, şikefteke dêwasa tê dîtin. Ji şikeftê wêdetir, dişibe bêrîka çiyê. Li rast û çepê vê şkeftê, çend şikeftên din jî tên dîtin. Navê vê şikeftê, şikefta Hezar Mêrd e. Navê xwe tê wateya "hezar mêr" ango hezar mêr têhiltê.

Ger bi seriyê vesiyayî, ango bi bêhna fireh li şarge û şikeftên Zagrosan lêkolînên berfireh werin kirin, ew ê hîn gelek tiştên meriv matmayî bihêle werin dîtin. Di rojeke nîşan de, aha vaye min li vê derê nivîsand!


**Têbinî 2:** Agahiyên der barê nexşeya Gûtî/Kur-tî yan de, ji pirtûka Ako Mihemed Mîrzadeyî hatiye girtin. Her wiha çend têbinî jî ji pirtûka Ethem Xemgîn a bi navê Dîroka Kurdistanê hatiye girtin.

**Têbinî 2:** Li sînorê vê nexşeyê hêla rojava, min bi çavên serê xwe hinek nîşanên şênber dîtine. Di dema pêş de, ez ê di vê mijarê de binivîsim.

## Mîna kelekekê û kelekvanekê

Heke parzemîna Afrîka û parzemîna Asya, hezretî Zagros, ango Zagrosê gewre hêrs bike ew ê mîna gaboxeyekî cixirandî quloçekî li parzemîna Asya, quloçekî li ya Afrîkayê bixîne; ew ê yekî ber bi zemherîra Sîbîrya, yekî ber bi dojeha Afrîkayê ve bişîne û ji wan veqete. Ew ê jê veqete, bi deştên li dora xwe bibe mîna kelekekê û kelekvanekî kal bimîne di nava deryayê de. Paşê bi tena serê xwe bimîne yek parzemînek. Tikî tenê bimîne. Mîna xwedê.

## Meselokên me û mirovên Neandertal



Di sala 1928'an de, hinek arkeologên pisporên serdema paleolîtîk, li gel hempîşeyên xwe yên herêmê, lêkolînekê li vê şikeftê dikin. Di vê lêkolînê de berhemên tevlihev tên dîtin. Di nava wan berheman de yên herî girîng, berhemên aydê mirovên Neantertal in. Dîroka wan tiştên hatine dîtin, xwe dispêrin derdora 50 hezar sal beriya niha.

Xwînerên ezîz. Mirovên Neandertal, ew mirovên gewre yên di nava meselokên kal pîrên me de, wekî "dêw, hût" ji me re digotin. Belê. Gava mezinan ji me re meselokên dêw/hût ê bi çavekî, yan jî yê bi her du çavan hitumkor ji me re digotin, wê şevê ew dihatin xewna me û em diqutifandin. Tu nabêje rastiya wan dêwên di meselokan de ye. Niha di ilmê zanista arkeolojiyê de ji wan re dibêjin: Neandertal. Û ev rastiyeke qethî ya piştrastkirî ye.